
# BERBANG

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTANÊ LI SWÊD



NECMETTİN BÜYÜKKAYA

YILMAZ DEMİR

HALİL ÇATAK

İSMET KARAK

LIBERXWEDANA GIRTÎGEHA DIYARBEKRÊ Û QETLIAMEK NÛ !

17/84

www.arsivakurdi.org

HEJMAR 17/84

# BERBANG

SAL 3

KOVARA FEDERASYONA KOMELÊN KURDİSTANÊ LI SWÊD

NAVEROK

Lıberxwedana gırtigeha Diyarbekrê û qetliamek nû.................. 3
Rapora xebatê ya Federasyona Komelên Kurdıstan Lı Swêd Sala 1983.......................... 6
Biranina 38 saliya Komara Kurdıstanê Lı Mehabbad...........................9
Karê Balwezi an sixuri...........10
Jiyına makinan û mırovan....12
Jean Jack Rouseau û lıhevhatına mırovan........... 14
Dinek lı ser xêni ye.............17
Cıvata Pêxemberan............ 19
Xaçerêz...............................22
Mendalê Mamoste.................23

O

Berpırsıyar
A. RIZA ALAN

Pergala Rûpelan
A. M. GILLY

Raxıstına Nıvisaran
SEYRAN û GULBAHAR

Redaksiyon
KEYXUSRO SİPAN-MAHMÛD
LEWENDİ-BENGİN BOTANİ
ŞORIŞGÊR ESKERİ-ROZA SEYRAN

O

BERBANG

*Kurdisk tidskrift, utges av Kurdiska Riksförbundet—Ansvarig utgivare och Redaktör: A. Rıza Alan—Layout: A. M. Gilly—Sättning: Seyran och Gulbahar.*

ADRESS
*Kurdiska Riksförbundet,*
*Tunnelgatan. 14, 3 tr.*
*111 37 Stockholm/SWEDEN*
*TEL : 08/ 11 23 42*

*Prenumeration: Medlemmar 50.- kr/år. Övriga 100.-kr/år.*

*Postgiro: 64 38 80—8*

Lı berxwedana zindana Diyarbekrê dom dıke !

Gırtıyên zindana leşkeri ya bajarê Diyarbekrê, dı Ilona 1983 yan de dest bı greva bırçibûnê kırın. Dı dû 15/20 rojan re, jı daxwazên gırtiyan hınek hatın bıcihanin.

Lê, gırtiyên zindana Diyarbekrê rınd pê dızanıbûn ku karbıdestên faşistwê dı fırseta yekemin de van "maf"ên wan paşda bıstinın. Lewre, jı merıv û malbatên xwe re dıgotın "haya we jı me hebe, mafên me yek bı yek paşda dıgrın, eger weha dom bıkın, emê cardın têkevın grevê".

Û dı destpêka 1984 an de, lıberxwedana bırçibûnê careke dın destpêkır. Dı vê navê re gelek roj nebuhurin ku dı nav merıv û xwediyên gırtiyan de xeberek dın belav bû: Çend beşên gırtigehê hatıbûn şewıtandın !

Nuha ji eşkere buye ku jı gırtıyan 5-10 kes mıri ne û 15-20 kes ji bırindar ın. Dı nav şehidan de yek jı pêşengên têkoşina rızgarıya Kurdıstanê Necmettin BÜYÜKKAYA ji heye.

Karbıdestên rejıma nıjadperest û mêtıngehkar jı zılmê, jı işkencê û jı rıjandına xwina gelê me têr nabın. Her ku dıçe dı xwinxwari û hovitiyê de, jı destbrakên xwe yên Nazi şûnve namının.

Hevalên hêja,

Lı gor xebera dawin pıranıya gırtıyan hin ji dı grevê de ne. Ew, lıberxwedana xwe dı nav agır û xwinê de dıdominın. Û bêguman, nuha alikari û pıştgıriya me dıpên.

Dıvê em, jı xwe, jı hevalên derûdora xwe û bı tıştên ku em dıkarın destpêkın: jı kes û rêxıstınên jêrin re telegraf û namên kurt(çar-pênc rêz) bışinın û bıdın şandın.

Jı meclisa Tırkıyê re- Jı serek komar, wezirê adaletê û serek wezirê Tırkıyê re- Jı mudurê gırtigeha Dıyarbekrê re-Jı fermandarê idara orfi ya Diyarbekır re-Jı komisyona mafên mırovi ya konseya Awrupayê re- Jı merkeza XaçaSor û lı welatê ku tu lê dıji: Jı serek wezir re- Jı Dêrê re- Jı xaça sor re, Jı Amnesty re- Jı sendikan re-Jı serekê hemu partiyên sıyasi re- Jı ajansên nûçeyan reJı radyo û televizyone re.

Mebêje' bı telegrafekê çı dıqede' dema ku telegraf bûn hezar, pênc hezar,deh hezar, wê jı gelek deran deng bılınd bıbın.

BERBANG

BERBANG

*Kovara Kurdi, Xwedi : Federasyona Komelên Kurdistanê lı Swêd. Buha : 5 Kron, Abona salekê: 50 Kron, 30 DM.*

NAVNİŞAN

*Berbang, Tunnelgatan 14,3 tr. 111 37 Stockholm/ Sweden. Tel : 08 / 11 23 42*
*Postgiro : 64 38 80—8*

www.arsivakurdi.org

# lıberxwedana gırtigeha diyarbekrê û qetliamek nû!

*M. Lewendi*

Her weki tê zanin ku, lı Tırkiyê, lı Kurdistanê û lı Awrupayê nav û dengê greva bırçibûnê ya lı Gırtigeha Diyarbekırê geleki belav bû, lı her derê Awrupayê jı bo pıştgırıya greva Diyarbekır protesto mıting û grev çêbûn.

Û lıberxwedana gırtiyên gırtigeha Diyarbekırê jı demekê bı şûnde bı serket, û dı çarçeweya qanûnên cuntayê de ba ji hın mafên insani gırtın, herweki, bı ziyaretçiyên xwe re êdi dıkaribûn nêzi 15-20 deqa bıaxıfyana, her weha dıkaribûn bı kurdi ji bıaxıfyana. Dê û bavê gırtiyan dê karibana tışt, herweki; xwarın, pere, û cıl û berg ji bıdana wan. Lê cunta faşist nuka disa ew heqên insaniyên ku gırtiyan gırtibûn hemûyên wan disa jı wan stend û zor û zehmeti û işkenceyan lı ser wan hina zêdetır kır. Lı ser vê yekê gırtiyên gırtigehê dı 3' yê Çıleya Paşinde disa dest bı grevê kırın.

Cunta faşist her çıqasi teror û tadeyiyan lı ser kesên gırti zêdekır ji lê, gırtiyên qehreman lı hember vê yekê seri dananin. Bı mêrxasi lı dıj sekının û greva xwe ji her berdewam kırın. Lê, cûnta faşist jı bo ku grevê bışkine zılm, zordesti û tadeyiyê hin zêdetır kır. Lê disa ji grev nehatıbû şıkandın. Lı ser vê yekê cûnta faşist û sayên wi yên dev bı xwin agır bı gırtigehê xıstın. Pêşi qoxuşek, dı pê re sê - çar qoxuş, agır pê ketıbû dışewıtin. Gırtiyên dı hundur de jı bo ku xwe jı ber agır xelas kın gava ku derdıketın icar leşkerên cûntayê ji lı derveyi qoxuşan êriş dıbırın ser wan. Dı pê vê bûyerê û erişa barbari re qoxuşên ku agır pê xıstıbûn hemû jı bın ve şewıtin. Û dı vê bûyerê de çar welatparêzên Kurdistanê hatın şehid kırın. Yên ku şehid bûbûn.

1- Necmettin Büyükkaya dı daweya PKK - DDKD de mahkeme dıbû.

2- Yılmaz Demir, dı daweya PSKT de mahkeme dıbû.

3- Halil Çatak dı daweya PKK de mahkeme dıbû.

4- İsmet Karak.

Lı dervayi van şehidan 17 kes ji bırindar bûbûn. Û disa gor nûçeyan navê pır kesan tê gotın ku wendabûne an ji mırıne

Merıv û eqrebeyên gırtiyan yên kû hatıbûn dora gırtigehê, hemû jı ali leşkerên cûnta faşist ve bı lêdan û tadeyiyan jı dora gırtigehê hatın bıdûrxıstın. Jı wan hınek ji hatın gırtın, kırın bın işkenceyan.

Disa dı 25' ê Çıleya Paşin 1984 an de dı mahkemeya KİP - DDKD de jı 50 - 60 kesi tenê 7-8 kes hatıbûn mahkemê, jı kesên hati ji yeki "Em dı ser cesedên gırtiyan re derbas bûn û hatın vêderê" dıgot. Û rewşa gırtigeh û mahkemê protesto kırın. Lı ser vê yekê bı emrê hakim ew kes bı lêdan û kotek hat derxıstın derve. Dı gırtigeha leşkeri ya Diyarbekır de bı aşikari qatliamek hatıbû pêkanin.

Dengê greva xwebırçihıştınê ya lı Diyarbekırê lı herder dınê belav bû, û her weha reşemızgina qetliamê ji jı ali herkesi ve hate bıhistın. Lı ser vê yekê lı her derê Awrûpayê bı cor be cor awayan tevgerên protestoyê hatın kırın. Her weha lı Swêdê ji jı ali Komele û rêxıstınan ve gelek belavok hatın belavkırın, gelek name hatın şandın bo Xaça Sor û Amnesty İnternasiyonal. Lı derveyi van, Federasyona Komelên Kurdıstan, BİR - KOM û İSTİB

www.arsivakurdi.org

(Yekitiya Pêşverûyên jı Tırkiyê Lı Swêd) ê ji belavokek lı ser vê bûyerê bı swêdi û tırki belavkırın.

Em belavokê bı kurdi lı jêrê çap dıkın.

Lı ser vê bûyerê Federasyona Komelên Kurdıstan, BİR - KOM û İSTİB ê herşê ya bı hev re dı 28' ê Çıleya Paşin de mıtingek pêkanin, nêzi 500 kesi dı mıtingê de beşdar bû. Mıtingseet dı 13' yan de jı Sergelstorg (Stockholm) ê destpêkır heta ber Sefareta Tırkiyê. Lı ber Sefareta Tırkiyê axaftınek kurt çêbû bı şûn de, icar qelebalıx berbı daira Radyo - Televizyona Swêdê çûn, lı wê derê ji nêzi 45 deqeyan salona Radyo - Televizyonê hate işxalkırın. Sebebê işxalê jı bo Radyo-Televizyon û rojnameyên Swêdê lı ser vê bûyerê bınıvisin û deng kın. Dı pê işxalê re mıting belav bû, bûyer dı pırê rojnameyan de û weşanan de hate nıvisin.

Lê dıvê tenê bı vana neyê sekının, dıvê neyê jı bir ve kırın ku hemû gırtigehên lı Tırkiyê û Kurdıstanê dı xeterê dene, û cûnta faşist herdem dê qetliamên nû pêk bine. Jı ber vê yekê dıvê em kesên welatparêz, pêşverû û demokratên lı derveyê Welat, lı dıj van bûyer û qetliaman bı her awa yên xwe derkevın. Jı bo qetliamên nû pêk neyên hemû rêxıstınan agahdar bıkın.

– Bıji lıberxwedana gırtiyên gırtigeha leşkeri ya Diyarbekır.

- Xwina şehidên me yên qehreman dê lı erdê nemine.

## DI GIRTİGEHA LEŞKERİ YA DİYARBEKIR DE QETLİAMEK NÛ !

Lı Tırkiyê û lı Kurdıstana Tırkiyê gırtiyên siyasi yên dı gırtıgehan de, lı dıj zordesti, tadeyi û işkenceyan lıberxwe dıdan. Lıberxwedan bı serketıbû û dı wê demê de ne bıtevayi be ji, lê disa ji hın maf hatıbûn gırtın. Lê dı pê ''Hılbıjartınên sexte'' ye 6 ê Çıriya Paşin ev mafên ku hatıbûn dayin hemû bı paş de hatın gırtın û tadeyi, ledan û işkence yên ku dıkırın disa zêdetır kırın.

Bı van tadeyi û işkenceyan re, dı 4'ê Çıleya Paşin de lı Kurdıstana Tırkiyê dı gırtigeha leşkeri ya Dıyarbekırê de hemûyên gırtiyan disa ketıbûn greva xwe bırçi hiştınê. Grev lı gel hemû ta deyi û işkenceyan her dom dıkır. Lê; leşkerên cuntayê bı hoviti êriş bırın ser gırtiyan (gor nûçeyên 24'ê Çıleya Pa şin). Bı vê erişa barbari re Necmettin Büyükkaya (bı daweya PKK – DDKD dıhat mahkemekırın), Yılmaz Demir (bı daweya PSKT dıhat mahkemekırın), Halil Çatak (bı daweya PKK dıhat mahkemekırın) û İsmet Karak bı wahşeti hatın şehid kırın, û 17 kes ji hatın bırindar kırın. Û disa tê gotın ku hejmara kesên mıri hin pırtır e.

Êrişên wehşi, işkence û teror her berdewam e. Jı bo ku lı derve yi gırtigehê kes bı tışteki nebise tu kesi nêzi gırtigehê ji nakın. Dê û bav û merıvên gırtiyan, ku lı dora gırtigehê kom bûne, hemû lêdan û lêxıstınê hatıne belavkırın, jı dora gırtigehê bı dûrxıstıne. Danûstendınên Awukat û gırtıyan bırine, tu awukat nıkare bı gırtiyeki re qise bıke. Cûnta hemû yên vana qedexe kıriye, her weha tırs û xofek ketiye hundurê cûntayê.

Roja 25.1 1984, dı mahkema PKK – DDKD yê de jı 50 kesi tenê 5 - 6 kes dı mahkemê de beşdar bûbûn. Jı gırtiyên ku derketıbûn makemê, yeki ''Dı gırtigehê de bûyerên nediti tên pek anin, me pêli laşên kesên ku hatıne kuştın kıriye û em hatıne vê dere'' got û rewş protesto kır. Lı ser vê gotınê bı emrê hakim ew kesê ku ev axaftına kırıbû, bı lêdan û lêxıstınê jı salonê hat avêtın.

Lı gel hemûyên işkence û tadeyiyan, lıberxwedan disa ji her berdewam e. Lı derveyi Diyarbekır, lı gırtigeha İstenbol Metris û Ankara – Mamak ê ji bı gelek hawayan lıberxwedan dom dıke. Ger lı hember van kırınên cûntayê yên dıj mırovi nê derketın, neyên sekınandın, dê cûnta hin gelek qetliaman pêk bine. Propaganda cûntayê her ew e ku derbasi ''demokrasi'' ye bûne. Lê, tenê jı işkence û tadeyiyên ku dı gırtigehan de pêk tên ji xuya ye ku derbasi ''demokrasi''yek çawa bûne. Rejima faşist dı bın siya ''parlamneteri'' yê de tadeyi û terora xwe hin zêdetır dıke û pêk tine. Jiyana cuntayê tenê bı kuştın, lêdan û terorê ye.

Em kesên pêşverû û welatparêz, şoreşger û demokratên jı Tırkiyê û Kurdıstanê bang dıdın; Gelê Awrupa, dairên parêzgêriya heq - huqûqê insani; Ajansên dengûbas û weşanan, Xaça Sor, Amnesty İnternational, Sendika, Kesên aşitixwaz, Dêr, Senetkar, Parlamentoya hemû dewletan, hukumatên wan, Partiyên siyasi, Konseya Awrupa yê û jı hemuyên insanetiyê re:

- Lı dıj buyerên ku dı gırtigeha leşkeri ya Diyarbekır pêk tê, lı dıj qetliam û buyerên nediti yên dıj insani, lı hember işkence û tadeyiyan ku hemû bı destê cunta faşist tê kırın derkevın.!
- Dıvê tu kes lı hember van bûyeran laqayt nemine, dıvê jı bo qetliamên nû pêk neyên, bête protesto kırın.
- Dıvê pıştgıri bı hemûyê ew kesên ku jı bo azadi û mafê mırovi şer dıkın, bête kırın.
- Bı taybeti jı bo bûyer û qetliamên ku dı gırtigeha leşkeriya Diyarbekirê pêk tê, dıvê heyet bête şandın.
- Dıvê xebata jı bo efûya siyasi bête kırın.

Federasyona Komelên Kurdıstan Lı Swêd – İSTİB – BİR – KOM

Beriya ku nûçeya qetliama gırtigeha leşkeri ya Diyarbekır bıgêje me, nameyek gıhişt destê me, em wê namê ji lı vê derê bı kurdi çap dıkın, name bı tırki bû.

Hevalê hêja ......,

Ne mumkun e ku em hal û rewşa vê derê bı her awayi jı we re bınıvisın. Dıvê mırov dı nav de be ku wê gavê baş jê fam bıke. Em hevidar ın ku gava ku we ev name xwend dıvê hun bıfıkırın da her weki hun lı vê derê, dı nav vê jıyanê de ne. Dıvê hun bı wi çavi vê namê bıxwinın. Em bawer ın, ku wê gavê hunê maneyekê jı vê nıvisa me derxın.

Jı roja sêşemê û vır de bırayên me yên dı hefsê de ne, dı nava pêt û alaviya agır de; wek tu agıreki bı gıyayê hışk vede, her weha dışewıtın. Buyera şewatê heta iro(şemi) ji dom kır. Belê, belê, hun çewt tê negıhiştın, dı şewitin !.. Roja sêşemê me ev xebera şewatê bıhist, ku dı hefsê de derketıbu û gırtıyên dı hundur de dışewıtin.

www.arsivakurdi.org

Gava ku me ev xeber,ev reşe mızgin bıhist, em dı cıyê xwe de sarbûn,mêjiyê me çelqya,ava sar bı çoga me de hat.Jı bo ku em rewşê fam bıkın,gava ku em çûn; me dit ku tıştên, ku hatıbûn gotın hemû rast bûn, qoxuşek dışewıti,ew ji me nızanibû kijan e. Lê dı pê roja sêşemê re(çarşem,pênc şem, in)rojên dın ji şewate dewam kır. Gırtigeh wek agırê cahnımê dışewıti.Dûmanek reş bı ser gırtigehe ketıbu.Û bı wê dûmana reş re deng û nalin û qirinên neçari û belengaziyê bılınd dıbûn,deng û nalin u qirinên neçari û belengaziyê bılınd dıbûn. Deng û qirin bı wê dûmana reş re berbı kûranıya esman ve dıçû û olan dıda. Qirin, hawar û nalin, bang dıdan; "Haho! haware,brano hawar e. Em ketıne bextê we ancax hun me jı vê agırê cahnımê xelaskın. Em şewıtin, em perıtin, em mırın!Rewşa hevalên me yên ku lı qatê jêr ın jı yê me xerabtır e.Cıyê me jı ber ku lı jor e,hun jı me hınekan dıbinın,lê yên ku lı qatê jêr ın,halê wan jı yê me xerab û xetertır e.Bısekının ! neçın, netırsın, hesab bıpırsın, jı her dere,jı her kesi."

Belê, bırayên me dışewıtin. Hım ji bı saxi,û em gêj bıbûn, tu tıştek me nıkaribû bıfıkırya.Dûmanek reş û bêhna goştê kızıri. Ew lı hundur, em lı der ve û jı destê me ji tu tıştek nedıhat ku me bıkıra.

Lı dora gırtigehê bı dehan, bı sedan erebeyên eskeri dıhatın û dıçûn, çı dıkırın me nızanibû, û yên lı hundur dıqiryan "Hevalno! Hogırno! em ketıne bextê we,wan erebeyan bısekınının, heval û hogirên me yên şehidın, pêşewayên me, bırayên me yên bırindar ın,......"

Belê, weha dıgotın bırayên me yên hundur. Û bı vê gotınê re hemûyên caman şıkandın. Dı pencereyan re bırayên me, hınek şewıti,hınek reş, hınek tazi, dest lı ba dıkırın, dıqiryan. Leşkerên wehşi ji, her lı wan dıxıstın û teneke û bidon lı hev dıxıstın da bıla dengê gırtiyan neyê derve.

Rewş heta iro ji dom dıke û xuyaye wê hin ji dom bıke. Ger heta iro ji mıri tunebın lê, jı iro û bı şûnde dê mıri hebın.

Heta nuha ki mıriye, ki maye em nızanın,kijan qoxuş pır şewıtiye kijan hındık, em bı wê ji nızanın.Tenê kesên ku lı dora hefsê, lı hêviya zarokên xwe bûn, ew ji jıbo da bızanıbın hela zarokên wan mırıye an maye.

Lı ve dere herkesi, jı her derê pırsi ûgotın, lê, feyde nine ew disa her weki xwe dıkın.

Hevalno ! Em ketıne bextê we, jı destê we çı tê ,dıvê hun bıkın.Hêviya me hun ın.

Em bawer ın çı jı destê we bê hunê bıkın.

1. 1. 1984


16

# Protester mot tystnaden

STOCKHOLM: 400 kurder och turkar gick in i entrén på Sveriges Radio i går eftermiddag.

– Vi vill protestera mot tystnaden i svenska massmedier, säger Haneli Celepli, en av demonstranterna.

# Mördad sörjs i tre dagar

STOCKHOLM: I tre dagar sitter de i en kal samlingslokal vid Hornstull och sörjer sin döde bror och vän.

Necemettin Buyukkaya med en av sina döttrar i tisdags fick familjen order att hämta hans döda kropp från militärfängelset.

Ledare

Stockholms Tidningen

Söndag 29 januari 1984

Torsdagen den 26 januari 1984 ★ EXPRESSEN

# ...ERAD TILL DÖDS

## ...nnade Sverige blev mördad ...rkiskt fänglse

Underjordiskt liv


Necmettin Büyükkaya

(Sala 1943 lı Kurdıstana Tırkiyê lı bajarê Sewêregê hatiye dınê. Hin xort bû ket nava şerê azadi û serxwebûna jı bo Kurdıstanê Jı ber xebat û karên xwe lı her çar perçên Kurdıstanê ji dıhat naskırın. Sala 1974 an de ilticayi Swêdê kırıbû, demek kurt lı Swêdê ma, bı şûn de disa vegerya Kurdıstanê, heta sala 1980 Dı 1980 yi de careke dın hate Swêdê, disa iltica kır û disa dı demeke kurt de vegerya Kurdıstanê. Sala 1982 yan de lı Kurdıstana Tırkiyê jı ali cûnta faşist ve hate gırtın û dı gırtigehê de hate şehid kırın).

Mıxabın, hevalên ku şehid bun, derheqê jıyana hemuyan de tu zanebûnek negıhişt destê me û her weha em ji lı ser xebıtin lê der heqê jıyana wan de û rısmên wan me peyde nekır.

www.arsivakurdi.org

# RAPORA XEBATÊ YA FEDERASYONA KOMELÊN KURDISTAN LI SWÊD SALA 1983



2 hefte pıştî kongra Federasyonê ya 3: a, dı 25.18.1983 da Komita Karger (KK) a nû cıvina xwe ya yekem pêkani, berpırsiyarên kar û barên Federasyonê tespitkır û her usa bıryar gırt ku KK her heftê carek cıvina xwe çêke. Dı dawiya Sıbatê da bıryar hat gırtın ku jı Komita Karger sekretaryat ava bıbe. Sekretaryat jı serok, sekreter û jı mali sekreter pêkhat. Jı Nisanê vır da sekretaryat her hefte, KK jı 15 rojan carek cıviya. Dı sala 1983 da 4 cıvin bı nunerên komelan ra çêbû. Roja cıvinê bı namên resmi hatiye şandın.

Wek tê zanin federasyonên biyaniyan alikariya zêdetırin jı İnvandrarverket (SIV) dıstine. Jı bo nasina hevdu, dı 1.3.1983 da, lı Norrköpingê KK cıvinek bı SIV ra pêkani. Paşê kar û barên sala 1983 bı nıvisandi hat pêşkêşkırın û raporên kongrê hat şandın.

Jı bo ku Federasyon tım vekıri bımine, KK bıryar gırt ku her roj bı dorê Federasyonê veke. Dı cıvina KK a 19.2.1983 da bıryar jı bo karkerek hat gırtın. Dı dawiya buharê da hewalek kurd weke "bredskapsarbetare" dest bı xebatê kır. Peywendiyên KK û Komita Çavdêr (KÇ) jı sala çûyin qenctır meşiya. Cıvinên muşterek hat çêkırın.

## DAXUYANİYÊN KULTURİ, PİROZİ Û PROTESTOYÊ

Federasyon wek rêxıstınên demokratikên dın, jı

www.arsivakurdi.org

bo mafên mılli kar û bar meşand. Jı bo eşkerê kırına zor û zulmê gelek daxuyani pêkani:

1- Dı 19.2.1983 da, lı Fridhemsplanê şeveke şaiyê pêkhat. Armanc ew bû ku peywendiyên dostani dı navbera kurdan de xurt bıke.

2- Komeki Kurdistani lı bajarê Karlstadê şevek dı 25' ê Sıbatê da çêkırıbû. Federasyon, bı axaftın û bı govendgêrên xwe va dı şevê da beşdar bû, şıklên dia nişanda.

3- Dı 23' yê Adarê da Newroz lı Stockholmê hat pirozkırın. Lı dora 1200 kes dı şevê da beşdar bûn. Jı bo meşandına kar û bar komita amadekar hat damezrandın, afişên şevê hatın raxıstın.

4- Dı1' ê Gulanê da Federasyon aktif beşdar bû. Belavok hat belavkırın û dı meydanê da govendên kurdi gelek bala kesan kışand.

5- Dı 31' ê Gulanê da Federasyon "Meşa protestoyê lı dıj êrişa leşkerên Turk lı Kurdistana Iraqê" pêkani. Meş dı nav demeki gelek kurt da hat amadekırın û jı 1000 i zêdetır kes dı meşê da beşdar bûn. Meş jı Sergelstorg destpêkır ber bı sefaretên Turk û Iraq çû. Belavok bı Swêdi û Kurdi hat belavkırın. Name jı Televizyon - radyo û rojnaman ra hat şandın. Her usa delegasyonek jı Komita Karger cıvinek bı Wezareta Dervayê Swêd ra çêkır, wan agahdarkır û pıştgriya wan hat xwestın.

6- Dı 4.6.1983 da lı Medborgarhusetê "Şeva Pıştgıriya Kurdistana İranê" pêkhat. Şev bı daxwazên kurdên İranê pêkhat, ku dı wê demê da rejima İran hazıriya êrişeke mezın lı Kurdıstan dıkır. Film ji lı ser Kurdistana İranê hat nişandan.

7- Dı 7' ê Tebaxê da Federasyon, jı pıştgıriya gırtiyên Turkiyê û Kurdistanê kır û lı Sergelstorgê daxuyaniya xwebırçihıştınê çêkır. Lı Turkiyê û Kurdistanê lı dora 6000 kes gırti jı bo protestokırına hoyên gırtiyan protesto pêkanibûn.

Daxuyaniya pıştgıriyê lı Swêd bı pêşverûyên Turk va pêkhat. 64 kes ketıbû vê daxuyaniyê. Pışti ku daxuyani dawi hat Federasyon cıvineke serfırazi û spasi pêkani û xwarın û vexwarın pêşkêş bû Televizyon radyo û rojnamên Swêd ji xeberan weşandın.

8- Dı 30' ê Tebaxê da lı dıj siyaseta Almanya Federal a biyaniyan hat protestokırın. Dora 200 kes çelengeke reş bır sefaretê û nameyê protestoyê da wan.

Hukumeta Alman sebeb bû ku şoreşgereke Turk Kemal Altun bı armanca protestokırınê xwe jı xani avêt û çû heqiya xwe.

9- Dı 12 İlonê da, bı munasebeta 3 saliya cunta faşist a Turk meşek protestoyê lı Stockholmê amade bû. Hêzên pêşverûyên Turk ji dı karê amadekırınê da cih gırtın. Bı swêdi, kurdi û turki belavok hatın belavkırın û afiş hatın raxıstın. Meş jı Sergelstor destpêkır berbı sefareta Turk va çû.

10- Dı 3.11.1983 da "Şeva Dıji Hılbıjartınên Sexte Lı Turkiyê û Kurdistanê" pêkhat. 600 kes dı şevê da beşdar bûn. Komiteke amadekar hat damezrandın. Bı swêdi, kurdi û turki belavok hatın belavkırın. Televizyona Swêd dı programê xwe da jı şevên naqlen weşand çêkır û bı serokê Federasyonê ra roportaj çêkır.

Federasyon Komeke Govendê avakır û dı du festiwalên da (Bergshamra û Söder) ji govendên kurdi pêşkêş kır.

## XEBAT JI BO PERWERDE Û FÊRKIRIN

Yek jı wan heri muhimtirina xebata Federasyonê dıvê jı bo pêşenda zaro û xortên me bête meşandın. Bêparmayina jı mafên mılli lı ser şexsiyeta zaro û xortên me bırinên kûr vedıkın. İro lı Swêd bı mecaleke pıçûkbe ji zaroyên me bê tırs û şerm dıbên em kurdın. Bê şık ew jı bırayên xwe yên lı Kurdistanê azadtırın. Lê belê hê ji gelek zaroyên me jı xwe ra zımaneke biyani wek zımanê xwe fêrdıbın. Disa gelek zaro henın ku jı kêmasiya materyalên fêrbûnê naxwazın herın kurdi bıxwinın. Dı vi wari da Federasyon bı wan karên jêrin rabûye:

1- Lı se peyvıstiya hinbûna zımanê zıkmaki broşureke kurdi derxıst. Broşur jı 12 rûpelan pêktê û dı çarçeva projeya reforma zımanê zıkmakiyê hatiye amadekırın û alikari jı SIV hatiye gırtın.

2 Bı serweriya Perwerdekari (Skoloverstyrelsen) ra gelek peywendi hat çêkırın, ku jı bo zaroyên kurd pırtukên kurdi were amadekırın. Jı bo wê yekê Federasyon bı Sazgeha Amadekırına Materyalên xwendegehan (Statens İnstıtutıon For Laromedel) ra komiteki pêkani, ku lı ser kijan pırtûkan pêwısti heye, tespit bıke. Ev komite heta nuha lı Uppsala û Stockholmê 7 cıvin pêkaniye û rapora xwe jı bo vê yekê dayê. Dı raporêda bı gıştî lı ser zıman û tarixa Kurdistanê enformasyon tê dayin. Dı dawiya raporê da saha xebatê tê diyarkırın. Jı bo ku ev tespit têkeve jiyanê komita xebatê jı pısporên kurd û swêdiya hat damezrandın.

3- Jı bo gihandına mamosteyên kurdi Federasyon xebateke hêja pêkani. Bı berpırsiyarê Sazgeha Uniwersite û xwendına bılınd (Universitet och Högskolaambetet) ra dan û standın pêkani Serokê sazgehê bıryar gırt, ku daxwaza beşa kurdi jı bo mamosta ya du sali bıke. Ew rapora daxwazê dı 12' ê çıleyê da dê jı tastika parlamentoyê derbas bıbe û beşa kurdi jı payiza 1984 da dê dest pêbıke.

4- Jı bo qeydkırına xwendewanên kurd lı Swêd peywendi bı Universita Stockholm beşa sekretari-

www.arsivakurd.org

yata biyani ya ra çê bû. Daxwaz lı wan hat kırın, ku gelên xwedewanên kurd lı Swêd gymnasium xelas kırıne, lê bı sebeba zordesti derketıne dervayê welat û diplomayê xwe nıkarıbûne bı xwe ra derxın, karıbın qeyda xwe lı universite çêkın û Federasyon jı wan ra bıbe referens. Ev daxwaz bı bıryarê sekretaryat hat qebûlkırın.

## PIRSÊN SOSYAL

Xebat jı bo pırsên sosyal bı xwe ciheki gelek fıreh dıgre. Mırov şevên kulturi ji têda dıhesıbine. Ez bawerım dı wi waride çend tışt hatın çêkırın, lê hêji kême. Bı kasi rewşa xwe Federasyon dı vi wari da xebatên jêrin pêkaniye:

1- Federasyon bı Statens İnvandrarverk ra komita enformasyon lı ser cıvata Swêd pêkani. Ev komite dê tespit bıke ku enformasyon bı çı rêyi qenctır bıghê kurda. Mırov rewşa jınên kurda bine berçavan û lı ser analfabet bûyina wan hınek bısekıne muhimbûna şêklê enformasyon dayinê ji hetani dereke dê eşkere bıbe. Ev xebat hê berdewame. Dı komitê da 3 kurd cih gırtıne.

2- Bı sosyalstyrelsen ra jı bo karên familjefedagogi danûstandın pêkhat. Daxwaza me ev bû ku lı Stockholm û Huddıngeyê karê familyepedagogi bête destpêkırın. Lı Tensta, Rinkeby ji karê projeyê, jı bo ihtiyaciya kurda bête domandın.

3- Bı sosyalburo ya Stockholmê ra lı ser rewşa kurda danustandın hat çêkırın û daxwazên me hat pêşkêş kırın.

4- Jı İnvandrarburo ya Stockholmscity hat daxwazkırın ku hevalê kurd ku lı wê derê asistanê kurda ye bıla karê xwe bıdomine.

5- Federasyon jı bo multeciyên kurd lı Swêd bıberpırsiyariya hevaleke kurd va muracatê projeki kıriye. Dı vi warida sala pêşiya me ev kar dê were meşandın.

## XEBATÊN DANZANİN Û DANÛSTANDIN BI PRESS RA

1- Dı 24' ê Tebaxê da, lı ser daxuyaniya xwebırçihıştınê lı Erzerom (Kurdistana Tırkiyê) danzanineke jı bo press radyo - TV hat belavkırın. Ev danzanin dı Sv. Dagbladet da hate weşandın.

2- Dı 9' ê İlonê da lı ser daxuyaniya xwebırçihıştınê lı Diyarbekır, danzanin (pressmeddelande) jı bo press radyo - TV hat belavkırın. Ev, dı rojnama Dagens Nyheter û radyo yê da hat weşandın. Hefteki beriya wi ji lı Sergelstorgê belavok hat belavkırın.

3- Dı 20' ê İlonê da bı munasebeta daxuyaniyên gırtiyan lı Diyarbekrê, Federasyon cıvina konferansa pressê pêkani. Enformasyon lı ser rewşa gırtiyan hat dayin. Danzanin pêşkêşê rojnamewanan bûn.

## XEBATÊN GIŞTİ

1- İnvandrarverk jı bo pırtûkeke lı ser kurda bı Federasyonê ra dıxebıte. Pırtûk dê bı swêdi be û dı derheqa kurda da enformasyona gışti dıde. Komiteke referens jı kurda pêkhatiye û alikariya niviskar dıkın. Beşa yekem ku bı gışti lı ser rewşa Kurdistan ê ye, Federasyon, rexne û ditınên xwe ji niviskar ra şandiye. Ditına me lı ser beşa duwem derheqa rewşa cıvaki ji hatiye gotın. Dı nêzikta beşa sêyem lı ser rewşa kurdên Swêd ji dê hazır bıbe û pışti çend mehan ji dê pırtûk çap bıbe.

2- Statens İnvandrarverk û Federasyon jı bo semınereke lı ser kurda dıxebıte. 4 kes jı SIV û 3 kes jı Federasyonê dı komita amadekar da cih gırtıne. Seminer lı Sigtunayê dê çêbe û lı dora 50 kes jı merciyên swêdiyên cıhê, parlamenter û rojnamewan beşdar bıbın. Seminer navbêna 4 û 6' ê Nisanê 3 roj e. Dı 5' ê mehê da lı Uppsala yê şeveke vere amadekırın.

3- Dı 6 -7' ê Oktobrê cıvini gruba referens ya mezın çêbû. Hemû federasyonên biyaniyan, serokê SIV, Kulturradet û hwd. lı cıvinê da lı ser rewşa biyaniyan axaftın. Federasyon zêdekırına alikariya literaturên kurdi û rakırına kampên multeciyan daxwazkır û bersiveke erini gırt. Her usa lı Tumba yê bı berpırsiyarên belediyê û nexweşxanê ra lı ser pırsên kurdan cıvin pêkhat.

4- Peywendi bı Riksradyo Swêd ra (Serokê Riksradyo) çêbû, jı bo programa kurdi daxwaz hat kırın. Her çıqas daxwazên me baş hat ditın ji, hê me bersiva xwe ya resmi negırtiye.

5 Federasyon dı anti - rasist komitê da xebıti û her usa jı bo hatına Yassir Arafat lı Swêd, 200 kron alikari kır û navê xwe dı Dagens Nyheter da wek pıştgır nıvisand.

6- Bı çend komelên ne endam ra ji danustandın hat çêkırın û jı hemû vexwendiyên rêxıstınên dın ra mesaj hat dayin.

7- Lı ser gırtiyên kurd bı Amnest İnternasional ra danûstandın hat çêkırın.

Komita Karger
Çıleya Pêşin 1983

www.arsivakurd.org



# BİRANİNA 38 SALİYA KOMARA KURDISTANÊ LI MEHABAD



Sal 1946, jı demsalan zıvıstan, 21' ê Çılêyapaşin, serokê Komarê derket ser kursiyê û got. ' Komara me, Komara Kurdistana Mehabad lı me û lı hemûyên Kurdên dın piroz be, ev Komar dê bıbe ronahiyek û dê tirêjên xwe bı çar aliyê xwe de berde' . Belê weha dıgot pêşewayê wê demê, Qazi Mıhammed. Û ev dewleta yekemin bû ku Kurdan navê cumhuriyetê, cumhuriyeta Kurdan bı karanibûn. Lê gelek mıxabın, lı hember dek û dolabên emperyalistan û şahê İran; Komara Kurdan pır lı ber xwe neda. Jiyana Komarê nêzi saleki ajot. Lê, dı pê re bı dek û dolabên İngiliz û İranê Komara Kurdistana Mehabadê hat hêlweşandın, Qazi Mıhemmed û hevalên wi ji hatın idam kırın. Lê, Komara Kurdistana Mehabadê dı vê jiyana xwe yi kurt de gelek karên bı kêr û baş kır Van kar û barana dı ali, abori, kulturi û siyasi de bûn. Bı taybeti jı ali kulturi de gelek pêşde çûn, wê demê radyoyek serbıxwe dest bı weşana xwe kır. Şair û nıviskarên Kurd yên wê demê lı ser hev kom bûn gelek kar û barên bıkêrhati kırın. Disa dı warê hunermendi û muzika kurdi de ji gelek karên hêja kırın. Lê, herweki me lı jorê ji got hemûyên van kar û baran jı bo menfeeta emperyalistan û şahê İran, jı holê hatın rakırın. Lê Kurd disa man lı ciyê xwe û Komara Mehabadê ji bû miraseki gelek gıranbıha jı bo Kurdan.

# KARÊ " BALWÊZİ " AN SİXURİ .?

*Sorışgêr Eskeri*

Rejima faşist a Iraqê tenê bı vê yekê nesekıniye ku jı wexta xwe ya hatına ser hukım û heta nuha; bı hezaran kesên welatpa rêz û nıştımanperwerên Kurdıstanê xıstıne zındanan û bı sedan ji jı wan dı bın êşkenceyan de şehid kırıne.

Lı dora hezar û pênsed (1500) gundên Kurdıstanê şewıtandıne û weran kırıne. Mılyonek cotkar û gundi jı ser axa Kurdıstanê rakırıne û şandıne ordugayên zorstû (Eskeri) sed hezar Kurdên Feyli jı Iraqê derxıstıne. Lı hemû cıyên sıtratêjik ên Kurdıstanê de lı şûna Kurdên ku derkırıne; Ereb anine bı ci kırıne.

Ev heşt salın ku lı hember gelên Kurdistanê şereki Hitleri çêdıkın. Jı sısêyan yekê (1/3) leşkerên xwe lı ser axa Kurdıstanê belav kırıne.

Serê çiyayên welat tuneye ku qerargeheke van faşistan lı ser tunebe. Bı sedan gund bı bombaran wêran û kavıl kırıne. Bı hezaran jın, zarok pir û xortên Kurdıstan ê şehid kırıne.

Sê sal beri nuha bı fit (plan) ên Emperyalizma Emerika lı dıji İranê dest bı şer kırın, ku bı hezaran kes jı gelên her du welatan bûne qurbana Qadısiya Seddam. Aboriya Iraq û İranê bı carekê û jı bın ve hatiye şıkestın.

Gelên her du welatan xıstıne bın barê qerz (deyn) ê ku bı deh salan dê nıkarıbın jı bın derên. Hemû azadi û serbesti yên demokratik lı gel û opozisyona Iraqê qedexe kırıne. Hêzên ku lı hember rejima Seddamê xwinmıj ın, her dem dı bın hêrış û êşkenceyên wan de ne. Heta jı efser (qumandan) û weziran ji hın kes disan bı destê van faşistan ve hatın kuştın.

Lê van Musoloniyên faşist eşkence û terorên xwe ne tenê lı hundurê welat, her weha jı destpêkê û heta nuha lı derveyi welêt ji dajon. Jı ber ku rejima van xwinmıjan rengdayinek (ekıs) sırûşti (xuzayi, tebieti) yê hundır e

Rejima bı ho (waste) ya destye yên xwe ya ajani lı aliyek û lı aliyê dın bı dev şêrin kırınê kampaniyên monopol yê welatên Emperyali, ku heya derekê karıne xebata gelê Kurd lı hember rejim lı derva yê welat ji veşêrın û perde bıdın ser tawan (guneh) ên wan.

Bı hoya şandınê kesên muxaberat lı ser navê xwendın û diplomatan dı rêya balwêzxana (sefaret) a Iraqê, jı bo plan çêkırın lı ser hêzên opozisyon û sıst kırına xebatê wan lı derva yê welat. Rûdayinên Berlina rojava, Paris, London, Viêna, Yemana başûr, Pakıstan, Kuwêt, Lubnan û Swêd belge yên heri başin jı bo selmandın (ispatkırın) a wan rastiyan, evaya bê jı rıştınê pere û pulên ku lı gelên Iraqê dızine û karıne hınek ji rojnamevan û karbıdestên welatên Europa rojava bıkırın, wan bıkın tûti yê pıropaganda ya xwe, û perdek bıdın ser ref tar (kar) yên wan xwinrêjan... Ew rastiya ji jı birkın ku evana ne tenê mırovkujın û zam (bırin) ên hundırê welatın, lê evana destga yên heri mezın û pisên cihanê ne, ku dı rasti yê de Balwêzên Iraqê karên dıplomatik jı bir kırıne, tenê bûne ciyên casûsi û mırov kuştın, ku tırsek a geleki mezın xıstıne dılê kesên ku bı destê wan hatıne derbeder kırın.

Karbıdestên welatên rojava, lı ber berjewedi (meslehet) ên xwe, gelek car dest lı zagonên (qanunên) dewletên xwe berdıdın jı tır sa rejima wan Hitleriya, lê, lı aliyê dın pıropagande dıkın ku dew letên wan lı hember û dıji terorizme. Çıma wextê teroristên Iraqê tên gırtın bı tevi belge (ispat) û dukomênt, tên berdan, bê ku bên muhakeme kırın. Nımûne yê heri baş ewe ku lı sala 1980 de xwestın kongıra AKSA bıpeqınn lı Berlin a rojava, bı çentek "T.N.T." lê disa ji hatın berdan !!?

Ev welatên rojava bıxwazın an nexwazın bı van karê xwe xızmeta rejima Iraq û teroristên wan dı-

kın û ne tenê lı hemer terorizm nasekının, lê pıştgırtiya terorizm dıkın... Loma baştır ewe, wela tên ku zagonên (qanunên) wan lı hember terorizmê rakın.. an peregırafek a dın lê zêdekın. Bı merc (şert) ek ku ew terorist ji teroristên Iraq û wan welatan hebe ku berjewendi (meslehet) yên wan dıxe tengasi yê..

Yek jı welatên ku balwêzxana Iraqê, dı nav de bûye kaniya ajan û teror, welatê Swêd e.. Lı sala 1978 -79 de ajan û sixarên rejima Seddam, yek jı serokên polis a Swêd kırın û gışt dokumentên ku lı ba polis bûn, lı ser penahende û penaberên (multeci) siyasi, ketın destê şagırdên Hitler. Ev sal ji tor (şebek) ek yê ajani dı meha 7/83 yan de hatın gırtın. Heta nûha ev tor karibûn ku hınek jı Kurdên tırsonek, sıst, xwefıroş û niştımanfıroş bıkırın jı bo karkırın bı balwêzxana Iraqê re, û dı rêya wan de bı karıbın bı penahende û penaberên siyasi dan û stendın bıkın, baweri bı wan binın ku paş da bıçın Iraqê, eviya ji çı dı rêya tırsandınê bû be 'ku lı merıvên wan eşkence dıkın" an dı rêya pere û sozên bê ciy û derewin wan kesên ku paşda ji çûne Iraqê bê ser û ci mane û wan wenda kırıne, yek ji jı wan bı navê Fuad Seid Abdulla hatiye kuştın.

Navê wan ajana jı ku heta nıha eşkere bûne evın:

1 Dr. Fewzi Tabo. Serek û berpırsiyarê torê ajani û mûxaberat a balwêzxana (sefaret) Iraqê lı Swêd Ev tawan (guneh) kar ûbe sagırdê Hitler, bı navê xwendın hatiye Swêd, ku goya Doktora dıke lı 'Akademiska Sjukhuset" ku mezıntırin nexweşxana Swêd ê lı Uppsala.
2- Dr. Munim Qiye. Cınsiya wi Sûriye. Bı nav penaberê siyasi bûye lı Iraqê. Sekeretêrê Dr. Fewzi.
3- Seyf Selahadin. Muxaberatê Iraqê, lı bajarê Stockholmê rûdıne, lı balwêzxana Iraqê kardıke
4- Dr. Eli. Endamê partiya Baass, û torê ajani, lı bajarê Uppsala rûdıne.
5- Dr. Suheyr. Endama partiya Baass, û harikara torê ajani, lı bajarê Uppsala rûdıne.
6- Dr. Henan weli. Endamê partiya Baass, û harikara torê ajani, lı bajarê Uppsala rûdıne.
7- Dr. Senan. Endama partiya Baass, û harikara torê ajani, lı bajarê Uppsala rûdıne. Ev "Dr." Felestiniye bı Dr. Henan Weli re Doxtora lı Bayomedicin dıkın.
8- Husam MEtê Eqwari. Lı bajarê Wasteros rûdıne, ev ajan gelek talûke ye û balwêzxana Iraqê veşartıne û xuya ye ku şandıne derva yê Swêd.
9- Hiwa Xalid Kerim. Lı bajarê Uppsala rûdıne.
10- Xazi Heme Emin. Lı bajarê Linkoping rûdıne.
11- Sabıt N'eman. Lı bajarê Goteborg rûdıne.
12- Dr. Brahim Mam Xıdır. Lı bajarê Kilafors rûdıne.
13- Karwan (jir) jin Ezet. Lı bajarê Uppsala rûdıne.

Hınek jı van xwefıroş û nıştımanfıroşan e, jı wan kesanın ku balwêzxana Iraqê şandıbû Swêd, bı navê xwendın û zemale, ku dı rasti yê de tenê jı bo karê siguri û ajani hatıne Swêd. Tevi wana hınek yê dın jı wanan ku bı navê reviyayın jı rejima Iraqê û jı ser xwinê şehid, xebat û fedakari yên gelê Kurdistanê, ci gırtıne lı Swêd. Dı bın perda penaberê siyasi...

Bera ev ajan, niştımanfıroş baş zanibın ku hertım navê wan dı nav rûpelên reş a dirokên Kurdistan û Iraqê de dımine û wenda na be. Hemû kat (wexit) ek lı jiyanê wan mırınek e, û gelê Kurdistan û Iraqê lı wan xweş nabe, rojek wê bê ku bı sıza (ceza) yên xwe bıstinın, xwinê şehidan ji rojek wan bı fetısine..

- Mırın û Rûreşi jı xwefıroş û niştımanfıroşan ra ye.
– Serketın û serxwebûn tenê jı gel ra ye.

HELBESTEK JI

Malmisanij

## GUNE, YASAX Û EYB

HÛMAY ZAF ÇİY GUNE KERDÊ MA RÊ
HUKMATİ ZAF ÇİY RA VA " YASAX !"
Û ŞARİ VA'EYB O.
ŞIMA ÇI VERDA MA RA ?
ÇI MEND ?

www.arsivakurd.org

*Ev nivîsar ji bo bîranîna heval Ekrem hatîye nivîsandin. Heval Ekrem li bajarê Frankfurtê di roja 14.1.1983. paşî teqînekê di mala xwe can da, çû dilovanîya xwe.*

# JIYİNA MAKİNAN Û MIROVAN

Rohat

Wi destê çep va nedihışt kaxızên spi bıfırın herın, destê xwe dıda ser û destê rast va ji rûpelên jı makinê derdıketın raçav dıkır, baş derdıkevın an an. Makine dıxıste nav singê xwe, namılên wi ji pır fıreh bûn, wi makine hembêz dıkır. Ekrem lı ser wê makinê serdestike bêhempa pêkanibû.

Ekrem çı bıkıra, makina wi hıneki kevn bû, jı hev derdıket, ew geleki şerpeze dıbû. Lê, dema wi singê xwe dıda ber, bı zora xwe va wi makine dıda xebıtandınê.

Çawa herkes baş dızane ku, dı dınya iro da tenê mırov çepıl û pışkokên makinan dızvirının, weki dın têkili tışteki nabın, xwe dıdın aliki.

Lê, Ekrem xwe nedıda aliki. Ew nedısekıni, dıhat û dıçû. Wi xwe nımz dıkır, jı bınva bınê makinê dınhêri, xwe bılınd dıkır lı ser pêçiyan jı jorva lê mêze dıkır, dızvıri çep - rastê wê kontrol dıkır, paşva - pêşva lê dınhêri. Bı kurti jı bo makine baş bıxebıte û nesekıne wi bı lez û bez makine sero - bıno dıkır. Çıma wusan lez dıkır ? Jı ber ku, makine kevn bû, carına pey hev dısekıni. Te dıgot cerdê lı ser Ekrem da gırtiye, wusan bı lez bû.

"Tık, tık, tık, tık" dıgot makinê, jı aliyê dın Ekrem hertım muzik ji guhdar dıkır, kılam û stranên kurdi û dengê makinê tevlıhev dıbû û jı bo Ekrem dıbû dilan.

Heval dıhatın, dıgotın "Ekrem sıbê meşin heye, an ji cıvinek heye lı dıji cuntaya faşist, hewce çend hezar belavok bên çapkırın'. Ekrem yek - dudu nedıgot, dadıkete jêr makina xwe saz dıkır, rûpelên spi dıda ber. Filmên xwe dıkşandın, jı bo kışandına filman dıçû oda tari, deri - pencere lı ser xwe da dıgırtın film dıkşandın, paşê ew berav dıkır, dıda ber tırêjê, demekê şunda ew êdi zuha dıbûn. Montaja rûpelan dıqedand, ew dı capxanê da ciwar dıkırın û çeplê makinê dızvırand, çapa rûpelên pêşin jı bo Ekrem pır gaveke hewaskar bû, jı ber ku ew destpêk bû, weki rûpelên pêşin baş derneketana, makine dıda seknandın.

Carına dema makine nedıxebıtin, Ekrem mılê xwe hıldıdan, xwe tazi dıkır, ew perçên wê makinê hemû yek - yek jı hev derdıxıst datani ortê. Çawa pezekê serjê dıki, ser - piyê wê jê dıki, paşê zıkê wê dıqelêşi, rûvıyan datini aliki, hûr - pızûran datini aliki, gurçık, gezeb û hemû organan jı hev derdıxi, Ekrem ji wusan bı fesal û bı pergal zıkê makinê dıqelaşt. Paşê kêmasiyên makinê dıgit, pıştı vê yekê careke dın hemû ew perçên belavbûyi yek - yek cih dıkır. Dema dıdit makine êdi saze, kêfa wi dıhate cih Hewasa wi dı vê yekê ra pır dıhat.

Dı wê jêrzeminê da, dema xebatê, wi xwe tazi dıkır, carına binek lı cıxarê dıxıst, hûr - hûr dumana cıxarê dıkşande hundurê xwe. Lê çavên wi hertım lı makinê bû. Makine bê Ekrem nedıxebıti, makineke wusan nazdar û kaw bû. Ekrem jı bo vê yekê ji carına destên xwe lı ser wan hesınên reş, hışk û sar dıbır - dıhani, makine mız dıda.

Bı rasti Ekrem û makinê bı hevra deng dıkır. Ekrem pır jı wê makinê hez dıkır. Rûnê wê dıqedi-

ya, rûn dıdayê, boyax dıdayê û zıkê wê têr dıkır. Makinê carke dın "Tık, tık, tık, tık" deng derdıxıst û dıxebıti.

Wi rûpelên spi davite ber makinê, paşê ew rûpelên spi, reş dıbûn, sor dıbûn û lı ser hev berev dıbûn. Pıştra wi deste - deste ew kaxızana jı ber devê makinê dıkşandın, deste - deste beş dıkır, part dıkır, datani ser hev. Dı nav van du - sê salên dawi da bı milyonan rûpel pırtuk, kovar, rojname, bang, broşur û ınformasiyonên mayin ber destê Ekrem ra derbaz bûn, keda wi pır derbaz bû û roda neçû. Ev materiyalana iro dı destê bı hezaran karker, gundi û ronakbirên kurd da dıgerın.

Tenê jı bo mıroveki makinek ewqas dıkare şırin bıbe. Makinek û mırovek ewqas dıkarın bıbın heval, dost û destebırak. Bı baweriya mın, wek Ekrem kêm mırov hene weki serpêhati û çıroka makinan xweş têgihiştıbe. Xebatheziya wi bê sinor bû. Wi westan çıye, nızan bû. Navbır nedıda xebatê, 20 seetan carına lı ser hev dıxebıti. Raste, ne tışteki başe, xelete, lê mırov nıkare pêşiya camêrên rojên teng bıgre.

Heta nivê şevê dıxebıti. Tenê lı wê taxê, tirêjên lempên çapxanê, dı nav şevereşê da xwe davitın derva, hemû neferên wê taxê jı zûva ketıbûne xewa kûr. Te lê mêze dıkır, sıbe lı Ekrem ron bûye, zelal bûye û sıbe lı Ekrem xweş bûye. Ev bû serpêhatiya bı salan.

Ekrem bı salan ciwan bû, zewıcibû ji çand zarokên wi hebûn, ew lı Kurdistanê mabûn. Ew bı xwe multeciki politik bû, nıkarıbû vegere Kurdistanê, hatıbû lı Elmanya Federal karkıriyê bıke.

Wi pır zû jı vê dınya kavıl bar kır, çû. Bêbexti, xayinti û neyariya mırınê bı baweriya mın çav berdabû xebathezi, zireki û jirbûna wi. Mırov qet naxwaze baweriya xwe bı mırına hevalên wek Ekrem bine. Mirata mırınê rûsare, yên mayin, gêş dıke. Bı rasti Ekrem mıriyê devê gorê ninbû.

HELBESTEK JI ZINAR ŞÎRO

## ÇIMA EM JI HEV DÛR BIN

Em Kurd hemî bira ne
Tev rizgarî dixwaz in
Rêzaniyên me hemî
Li dû ev doz dibazin.
Em tev divên nîşfiman
Bibin xwedî Kurdistan
Gel derkeve ji destan
Welat bibe gulîstan.
Em hevalê kedkar in
Tev dijminê zordar in
Bo wek - hevî li kar in
Li emperyal neyar in.
Ger rast hevpişkî bin em,
Rast ku welatparêz bin
Bê fort û zirt û derew
Ku xwedî doza xwe bin.
Çima em ji hev dûr bin
Ji hev ra wek neyar bin
Ji na yekfî nikar - bin
Hember neyar em rabin
Neyar wek gamêşê hêc
Lêde me tev bike hêç
Gelê me bike bilêc
Em dernên ji çewte rêç
Neyariya hev bikin
Dijmin li xwe çar bikin
Riyan li xwe teng bikin
Ferman li xwe rabikin.
Bese ev karê em tê
Ka bêj çi bêr heye tê
Ger dernên ji vê kortê
Dê em tev ser bidin tê.
Ger rast rizgarîxwaz bin
Divê em nêzê hev bin
Dijîtiyên xwe rakin
Vêrastiyê bibînin.
Dûr bin ji payexwazî
Li mafê xwe binêrin
Doza welat ji ya xwe
Em bilintir bibînin.
Ji bîr mekin ku neyar
Dixwazin me ji hevxin
Me berdinhev bêlin qels
Ew pişta me bişkênin.
Jîr û zanay, şiyar bin
Çi bi zanîn, nezanî
Nebin berdar bo dijmin
Em welat nêlin şînî.
Guh ne dın mixrikên hûr —
Em rewşa xwe bibînin
Rewşa reşa ku em tê
Bêcan jî jê ra digrîn.
Li ser gelê me îro
Ar û barût dibare
Namûs kete nav lingan
Keç û bûkan hewar e.
Di bin vê sîtema hov
Gelê me dîl û jêr e
Hê me neşewtê bêvil
Keysê didin neyare.
Şerm û fehêt û namûs
Divê em mil bidin hev
Em yekîtî an enî
Sazkin bi dil ne bidev
Dest bidin hev bira
Bimeşin em bihevra
Wekî pileng û şêra
Êrîş bibin neyara.
Bi tektîk û bi rêzan
Derkevin serê çiyan
Vêxin agirê şoreş
Li her derê Kurdistan
Wekî Vîetnamî em
Pêkbînin enî gelêr
Rizgar bikin Kurdistan
Nehêlin derd û keder.
Gazin dike gel hemî
Ji derdê na yekîtî
Ew pir dêşin bi ev yek
Wekî jana dilîtî.
Ji dest tûranperestan
Bûn xwînê ji Kurdistan
Lê derdê na yekîtî
Kûr kir jana Kurdistan
Binale bes tu zinar
Ma kî dike guhdarî
Ta hebe payexwazî
Ranabe ev neyarî.
Bese ev payexwazî
Ev xwexwazî ezîtî
Gel dikşîne ji ev yek
Êşa dilî, bindestî.
Ji bîr mekin ku dîrok
Dê me jêpirs bibîne
Bi rûreşî me tevan
Li rûpel xwe dê deyne.

# JEAN JACK ROUSSEAU Û LIHEVHATINA MIROVAN

— Cihangir Şero

## DESTPÊK

Dı qırnê 1700 da gelek ditınên core cor dıhat mınaqeşekırın. Filosofan ditınên xwe bı sistem dıkırın. Hınek ditınên sistemkıri wunda dıbûn û lı cıhê wan sistemên nûh pêkdıhatın. Dı vê wextê da bıpırani lı ser felsefa ronahiyê dıhatê seknandın. Lı dıj ditinên ronahiyê, an ji lı gel ditınên ronahiyê komık çêdıbûn. Ronakbiran û ilmzanêyan dı van munaqeşeyan da cıhê xwe dıgırtın. Munaqeşe lı ser ditına pêşketınê. naverok û netica cıvateki ronak da kom dıbû. Filosofên ronahi, fıkrê pêşketına cıvatê dıparastın. Cıvat û tarix her pêş da dıçû. Mantıqê fıkrên pêşketınê, vana nişani mırovan dıdan.

## DIJAYETİYA ROUSSEAU

Yek jı filosofên wê wextê, ku van baweriyana qebûl nedıkır, J. J. Rousseau bû. Rousseau pışta xwe guheri bû lı dıj hemû fıkr û baweriyên pêşketınê û cıvateki medeni. Bı baweriya Rousseau medeniyet û pêşketın gelek zırar dabû mırovan. Weke pır kesan dıgot; medeniyet û pêşketın mırovan azad û dılxweş nekırıbû. Her tışt bı çewti pêş da çûbû. Mışkuleyên mırovan zêdetır bıbûn. Mırovan bı hevra şer kırıbûn. Lı ber vê yekê ji Rousseau; mırovên primitiv (cahil) dıparast. Şıvan û gavan bêderd û xem bûn. Serazad û bıdılxweşi jıyana xwe derbasdıkırın. Lê, mırovên medeni û pêşketi ne seraza û dılşad bûn. Her weke ku dı zındanê da dıjiyan.

Dı atmosfereki weha da, ku hemû hêjayi û qıymet ser û bın bıbûn. Roussea ditınên xwe lı ser cıvat heq û huqûq bı sistem dıkır. "Vegerın tebieti" parola Rousseau ya bıngehin bû. Jıyana mırova pêvist bû ku lı gor tebietê pêş ve bıçû ya. Mırov jı tebietê çêbıbû û dıvêt paşde vegeriya kokê xwe ji. Tebiet û mırov ewê bı hevra pêşda bıçûna bıbana yek û dıjitıya dı navbêna cıvat û tebietê da ewê rabûya. Lê belê pêşketın çevt bûbû, cıvat û tebiet lı dıji hev dıherıkın. Çewti dı vır de bû.

Lı gor filosofên heqê tebieti, mırovan dı cıvatê de baweriya xwe bı seroka ani bû, û iktidar teslimi wan kırıbûn. Mırov dıkare bêje ku, lı gor vê baweriyê gel, heq û iktidarê xwe dabû serokê xwe. Gel, pêwist bû ku bıde dû serokê xwe, bı awan bıke û jı riya wan venegere.

Lı dıji van ditın û baweriyan Rousseua rawesitya û rexne gırt. Rousseau dıgot ku ev gehineka (proses) bê lıhevhatınek cıvatê (kontrakte sociale) ne bûye. Ev lıhevhatına sosyal bı hınek şert û daxwazan hatiye meydanê. Serok û gel lıhevhatıne. Daxwazi û wazifeyê herdû yan ji lı ber hev hene. Gel pêwist nabe bê heq bıbe; serok nabe ku her tışti lı gor daxwaziya xwe bike. Serok; ewê lı gor gel bıçe û ne ku gel lı gor serok bıçe. Bıngehê lıhevhatınê ew bû. Gel dıkarê serokê xwe bıguhere û mırovê nuh bine dewsa wan, lê serok nıkare gelê xwe bıguherinın. Mırov dıkare bıbêje ku general bê sûpa (esker) nabe, lê belê sûpa bê general dıbe. Dı merhela dawi de her du pêviste, bı hevra hebın. Her du lı cem hev ın, jı bo armanceke siyasi û cıvati. Rasti ev e, dıvêt wusa bê.

## LIHEVHATINA CİVATİ

Grotius dıgot; iktidar bes jı bo serbaza ye (karbıdest). Mırovati ya sed (100) piyava ye lı gor Grotius. Lê belê Rousseau dıgot; mırov dê nıkaribe bersiva sualê jêrin bıde; ma gelo mırovati ya çend pıyave hılbıjartiye, an ji çend mırova hılbıjar-

ti ye, mırovati yê ? Hobbes ji wusa dıgot. Lı gor Hobbes; herkesi dı tebietê de lı dıji hev şer dıkır. Bı lıhevhatına mırovan rê, merhaleyeki nûjên dı dirokê da destpêkırı bû. Mırovatiyê qedera xwe teslimi serokê xwe kırıbû. Û jı ber vê yekê ji heqê tu mırovi tune bû ku serihılde lı dıji serokê xwe. Jı ber ku bı rakırına rewşa tebieti seri ji hatıbû rakırın û merhela cıvati detpêkırıbû.

Rousseau bı mêrxasi lı dıji vê ditın û siyasetê rawestiya. Lı gor heq û huqûqê mırovan, qet tu kes nıkare heqê mırovan ku dı peymanan de nıvisandıye rake. Heqê tu mırovi tune ye ku mıroveki dın bıke kolê xwe. Heq û koleti lı hev nake, lı dıji hev e Ev ditın bıngehê xwe, jı teoriya lı ser mırovati ye ku dıbêje; 'Her mırov jı dayıka xwe azad hatıne cihanê' dıgre. Dı cıvata kevnare (primitiv) da mırov jı dayıka xwe azad hate cihanê lê belê bı pêşketına medeniyetê (sivilisazyon) û cıvatê va azadíya mırovan jı destê wan hate gırtın. Bı lıhevhatına mırovan azadiya mırovan ji jı meydanê rabû û teslimi seroka bû.

Şeklê (formê) lıhevhatına yekemin dı cıvata primitiv da, lı gor Rousseau, aile ye. Aile dıkare bes bı lıhevhatınê, hebûn û jıyana xwe bıdomine. Hemû endamên ailê azadiya xwe heye. Dı teoriya xwe ya lı ser sıvılisazyonê, Rousseau ailê jı xwe ra esas dıgırt. Vana lıhevhatınên tebii bûn. Dı aileki da kole tune bû. Tu mırov kole nehatiye cihanê, lê belê bı destê hınekan hatıye kolekırın. Jı ber vê yekê ji dıvêt; mırovati lı dıji koletiyê serihılde. Mırovên ku azadi ya xwe neparêze, dı rastiyê da vazife yên xwe yê mırovati ji naparêzê. Rakırına azadiyê, rakırına mırovatiyê ye ji, Rousseau dıgot ku; lıhevhatıneki ku lı ser esasên; azadi jı bo yek aliki û koleti ji jı bo yek ali hatıye avakırın vala ye. Vana lı hev nehatıne. Neheqi dı vi esasi de heyê. Lı ber vê yekê ji mırov nıkare bıbêje ku ew lıhevhatıne.

Gelek mırovan û bı wan ra ji Grotius dıgot ku koleti jı netica şer pêkhatiye. Lê belê Rousseau dıgot ku wana çewtiyeki dıroki ye. Mırov dıkare lı dewletê mêzeke. Dıjmınayeti, ne dı navbêna şexsade ye, lê belê dı nav dewletan da şer dıbe jı bo mal, mulk û dewlemendiya cihanê ye. Weke misal mırov dıkare bıbêje ku ewê dewlet jı meydanê rabe, lê belê heq û huquqê mırovan kes nıkare jı meydanê rake. Mırov û mırovati lı ser vê yekê ji lıhev hatıne. Bê daxwazi ev lıhevhatın nameşe. Daxwaziya mırovan cıheki merkezi dı teoriya dı teoriya Rousseau ya lı ser cıvatê da ye, dıgre. Daxwazi esas e. Mırov dıvêt lıhevhatınên mırovan jı aliyê axlaki da têbıghê. Serokek çuqas têgıhışti, zana û mezın be ji, dê nıkari be lı gor bes daxwaziya xwe bımeşe. Dı vır da daxwaziyên dı lıhevhatınê da û peymanê da esas ın

Dıtıneki lı gor wexta xwe pır orjinal lı cem Rousseau; ditınên vi yên lı ser wekheviyê ye. Heqê cıvatê tune ku tu caran barê cıvati bıde ser mılên endamên xwe. Usûla tıştên siyasi û sosyal heye jı bo dayina biryara dı cıvatê de, hınek organên bıryarıan hene. Ewana bı daxwaziya gışti ya xelkê ve hatıne hılbıjartın. Ev organên siyasi dıkare, parleman be, dıkare qral be, dıkare koma biryardanê be ûhw. Tiştê gıring ne ew e. Gıringıya cıvati dı vê de ye ku van organan ew ê lı gor daxwaziya gışti û başiya xelkê xebat bıke.

## DAXWAZİYA GIŞTİ

Daxwaziya gışti lı cem Rousseau, gelek hatiye munaqeşe kırın. Naveroka daxwaziya gışti pır caran nevekıri ye. Gelek mane yên xwe hene, lê belê mırov dıkare bıbêje ku daxwaziya gışti; babeteki dengdan û netica vê ye. Dı vê dengdanê de dıvêt hemû endamên cıvatê beşdari bıke. Hemû kes weke şexseki xebatê bıke. Kes dıvêt nûneriya tu fraksıyon, grupp, komık ûhw. neke. Mırov bes dıkare nûnerê xwe be. Temsilciti dı daxwaziya gışti de tuneye. Daxwaziya gışti; ne daxwaziya hemû kesan e, lê belê başi û rındıya hemû kesan dıgre ber çavan. Daxwaziya gışti; daxwaziya şexsi û menfeetên şexsi va lı hev nake. LI dıji hev e. Û lı cıhê ku yek ji wan destpêdıke, êdi xelas dıbe.

Endamên cıvatê beriya dengdanê, dıvêt baş agahdar bıbın, lı ser problemên cıvatê. Ditın hemû zelal bıbın, xet xuyani bıbe, rê roni bıbe. Beriya ku bıryar bêdain, pêwist e hemû şexs xwe izole bıke û tenê lı ser mışkuleyên cıvaki bıbe xwedi bıryar. Kes nevêt tesir lı hev bıke. Mırov dıvêt lı dengêwijdanê xwe guhdari bıke û pey kesi de neçe. Cıhê pêxemberan lı vır nine. Jı ber ku hemû şexs ne wek hev ın, jı netica vê newekheviyê, daxwaziya gışti bı awayeki rasti derdikeve meydanê.

Paşi ku biryar hate dain, dıvêt hemû mırov hûrmet jı daxwaziya gışti ra bıke. Usûl wusa ye. Jı ber ku jı aliyeki da pıraniye bıryara xwe daye, û jı aliyeki da ji ditınên şexsi yên muxalif xuya dıke ku çewt ın. Mırov dıkare bıbêje ku daxwaziya gışti diktatoriya pırani yê ye. Hêz dı destê pıraniyê de ye. Vaya, bû problemeki pır mezın jı bo Rousseau. Jı ber ku jı aliyeki da Rousseau daxwaziya şexsa û azadiya mırovan dıparêze û jı aliyeki da ji dıbêje; şexs pêwist e bı dû pıraniyê da bıçe. Dı paşiya bır-

www.arsivakurdi.org

yardanê da, azadiya mırovan û daxwaza şexsi dı rastiyê da, roleki naleyize. Xeta rasti jı bo hemû kesi ye. Gel dıvêt lı ser vê rıyê bımeşe. Mırov bı kurti dıkare bıbêje ku, daxwaziya gışti tu cari xeletiya nake.

Dijayeti dı navbêna kolektivite û şexs da; dıkare dı dengdanê da, dı dewlemendiya da, dı daxwaziya gışti da, derkeve meydanê. Dı hemû dıjayeti ya da dıvêt şexs bı ya kolektivitê bıke. Dı merhela dawiyê da mırov kare zorê ji bıkarbine lı gor Rousseau. Lê ew zora bı xwe ra zordariyê pêk nayne. Dı rastiyê da vana ne zor ın ji. Lê belê mırov dıkare bıbine ku dı rastiyê da cıhê şexsa û azadiya wan bes dı cıvatê û kolektivitê da, realize dıbe. Jı ber vê yekê ji şexs dıvêt cıhê xwe baş nas bıke û dı meselên gıran de bıde ser riya pıraniyê.

## DAWÎ

Pışti hınek fıkırandınan mırov dıkare bıbêje ku, peyva zor û azadiyê, nabe cor be cor bêye ditın. Hemû gotınên lı ser azadiyan, bı zanısti an ji ne bı zanısti, ditına zorê jı aktualize dıke. Pır caran ew danûstandına dialetiki tê jı birkırın. Rousseau her gav, dı bıra mırov tine ku, problemên cıvati, felsefi, sosyal ûhw. jı hev izole nine. Problem dı merhelên dawi da her gav bı hev ra gırêdayi ne. Dı siyasetê da ev problema pırtır roni dıbe.

Rousseau dıkare alikariya mırovan bıke ku em problemên cıvatê baştır tê bıgıhên. Lê belê, mırov dıkare bêje ku, Rousseau pır caran dı ditınên xwe da zelal nine. Avahiya ditınên Rousseau tevlihev e. Dı maneyeki ku Rousseau dıbêje; iro lı tu cıhi ne wekheviyeki durust, ne ji demokrasiyeki rast pêkhatiye. Hınek cıvat iro lı cihanê, jı hınek cıvatan baştır ın, lê belê problemên wekheviyê û demokrasiya rasti heta iro ji, dı dırokê da nehatiye halkırın. Cıvata Rousseau ya ideal dıkare sempatik û xwe xuya bıke, bala pır mırovan bıkışine ser xwe. Mırov dıkare lı ser cıvateki wusa gelek munaqeşe bıke, her gav feyda wê ji mırovan ra heye. Utopia pêkanin gelek caran hêsan e, lê belê dı praktikê da realizekırına uropia, qet hêsan nine. Cıvat pırali ye, gelek şax û perên wê hene, ne weke ku mırov daxwazdıke. Cıvat beri me pêkhatiye. Lê mırov dıkare cıvatê bıguherine, xweştır bıke, baştır mırovan fahm bıke û bı hevra jıyaneki dılxweş avake.

---

## LI ZAROKXANA MYRAN - F Î T J A YÊ BO ZAROKÊN KURD BEŞEK VEBÛ !

Lı fitja'yê lı zarokxana MYRAN (Öppna förskolan)ê beşê Kurdi vebûye. Dı vê kursê de,dê zarokên kurd yên pênc sali bıgıhinın, jı bo ku wan amade bıkın bo dıbıstanê. Em lı vê, swêdi û kurdiya ilana zarokxanê çapdıkın.


Till Målsman,
Ditt barn ska nu börja på en skolförberedande kurs för femåringar på öppna förskolan Myran. Krögar vägen 8. Tel 78228-FITJA
På den här kursen kommer barnen att få lära sig att klippa, måla, rita, skriva sitt namn, lyssna på sagor, dansa, sjunga leka osv.
Kursen börjar MÅN. dagen den 23/1/84 och håller på fram till sommaren.
Om ni nar något att fråga om kan ni ringa till öppna förskolan under kurstiden Tel78228 och fråga efter Ann Gustavsson

Jı dê û bavan re,
Zarokên te dıkın nu dest bı kursekê bıkın ku kurs dê zarokên te yên pênc sali têbıgıhine û amade bıke jı bo dıbıstanê. Ci: Öppna förskolan-Myran, Krögarvagen 8, Tel: 78228
Kurs dı 23/1/84 de roja Duşemê..ê destpêdıke û heta serê havinê dom dıke.
Ger pırs û daxwaziyên we hebın hun dıkarın dı nava wextên kursê de telefoni 78228'an bıkın û agahdariyê jı Ann Gustavsson bıstinın.

www.arsivakurdi.org

AZİZ NESİN

# DİNEK LI SER XÊNİ YE



wergêr: M. Lewendi

Yên ku lı wê taxê bûn, hemûyan bıhistın ku;

– Dinek lı ser xêni ye !

Kuçe jı sêri heta dawi jı kesên ku hatıbûn temaşa din bıkın tıje bûbû

Pêşi jı qereqolê, dı pê re jı mudûriyeta emniyetê bı erebeyan polês hatın. Dı dû wan re ji itfaiyê xwe gihandê.

Diya din lı ber lawê xwe dıgerya, lavayi dıkır;

– Kurê mın, lawê mın peya be jêr..! De heydê Kurê mın dakeve jêr. ...!

Din jı yên jêrê re dıgot:

– Ger hun mın nekın muxtar ezê xwe bavêjım jêrê !

Memûrên itfaiyê, tora xwe vegırtıbûn, da ku din xwe bavêje tıştek pê neyê. Neh memûrên itfaiyê, dı dest wan de tora itfaiyê û hıngi ku lı dora apartmanê dıçûn û dıhatın, jı xweydanê şıl bûbûn.

Komsêr:

– Rıca dıkım, bırê mın dakeve jêr, peyabe.

Komsêr bı niv çavtırsandını û bı dengeki nivçe nermi dıxwest ku din bıxapine.

Din:

– Mın bıkın muxtar, ezê dakevım, an na ezê xwe bavêjım jêrê!

Lavayi, lıbergerin, çavtırsandın hemû bêfeyde bûn, yek ji bıkêr nehat.

– Bırê mıno, de lo !.., de dakeve lo !

– Hêla jı xwe re lı van bınêrın, ma hewcê ku hûn dıxwazın mın daxinın jêrê, hema hûn derkevın jorê !

Jı nava boşahiyê yeki jı temaşevanan re got.

– Hema me ew kır muxtar, dê çı bıbe ?

Yeki dın:

– Nabe lo... Ma dê çawa bıbe, jı dineki muxtarek, ma qet dıbe !

Yê dın

– Hella ! Hella ! Ma qey em wi bı rasti nakın muxtar !

Kaleki bı gopal ket navê;

– Nabe, qet nabe, bı rasti ji, bı heneki ji, nabe ku hun wi bıkın.

– Dıbe ku dakeve.

– Danakeve, ez bı vana dızanım, heke carekê derketın jor bı şûn de, êdi qet danakevın jêrê.

– Hela bıla carê dakeve jêrê, yê dın hêsan e.
– Danakeve.
Yek jı jêrê qirya û got.
– Me, te kır muxtar, de heydê were dakeve jêrê, peyabe !
Din lı jorê dest bı listıkê û lotıka kır û got:
– Danakevım ! Ger hun mın nekın endamê meclisa bajêr, ezê xwe bavêjım jêrê !
Kalê bı gopal jı yên dora xwe re got:
– Çawa ye, we dit, ma mın jı we re negot ?
– Çı dıxwaze em bıkın.
– Na, çû êdi, hûn çı bıkın êdi nayê jêrê. Heke mırov bı qasi derketına ser xêni din bıbe bı şûn de êdi mırov danakeve.
Komsêr:
– Me qebûle, me tu kır endamê meclisa bajêr. De heydê peya be, dakeve jêrê, da bıla van hevalan nepên.
– Danakevım ! Mın bıkın serekê belediyê, wê gavê ezê werım jêrê.
Kalê pirê bı gopal disa jı yên dora xwe re got:
– We dit! Nıha êdi qet nayê jêrê.
Komutanê itfaiyê dı nava xweydanê de mabû û jı yên dora xwe re got:
– Ma hema bıkın serekê belediyê ji, dê çı bıbe.
Dı pê re her du destên xwe bır ber devê xwe û bı dengeki bılınd berbı jor qirya û got:
– Bırako ! Me tu kır serekê belediyê ji, de peyabe were ser karê xwe.
Din icar dı cıyê xwe de list û çındık avêt û got.
– Na ! Ez danakevım, ma ew kesên ku dineki bıkın serekê belediyê, çı karê mın dı nav wan de heye, ez nayêm jêrê.
– Pır baş, de ka bıbêje, tu çı dıxwazi ?
– Ger hun mın bıkın mebûs, ezê dakevım !
Yên lı jêrê axaftın û raberızinek (munaqeşe) kurt dı nav xwe de çêkırın şûn de gotın:
– Pır baş, me qebûle, me tu kır mebûs. De heydê êdi dakeve jêr.
Bınêre herkes tê dıpên lı hêviya tene.
Din destê xwe bır ber pozê xwe û berbi wan lı bakır û got:
– Nayêm jêrê ! Ma ez qet têm nava wan kesên ku dineki dıkın mebûs.
– De heydê bırê mıno ! Bınêr me tu kır mebûs ji. De dakeve were jêrê, mebûsên dın lı hêviya tene.
– E êêê ! Ma mın tıliya xwe dı çavê xwe re kıriye, ku ez dakevım jêr. Ez bêm jêrê û hun ji mın bıgrın bavêjın timarxanê ha !. Ez danakevım !..
Kalê bı gopal disa jı yên dorê re got:
– Billeheq xwe newestinın, ew êdi danakeve, lewra ez van dinan pır baş nasdıkım. Heke we bıkın mebûs, da hunê ji nexwazın dakevın.
Din lı ser xêni qire qira wi bû diqirya;
– Ger hun mın nekın serek wezir, ezê xwe bavêjım jêrê.
Yên lı jêr;
– Qebûl ...! Me tu kır serekwezir.
Kalê bı gopal got:
– Na, disa nayê jêrê.
Din disa dest bı listıkê kır û got:
– Mın bıkın qral ezê bêm jêrê, an na ezê xwe bavêjım !
Tıştên ku Kalê bı gopal gotıbû, hemû rast derdıketın. Ên lı wêrê bı wi şêwırin û jê re gotın:
– Tu dıbêji çı ? Em wi bıkın qıral ?
Kalê bı gopal got.
– Carê jı dest fılıti çû, êdi ew çı bıbêje dıvê hûn bı cih binın. Çawa be we kıriye serek wezir.
Yên lı jêrê icar jı din re gotın:
– De haydê were dakeve. Me tu kır qral ji !
Din lı ser xêni jı xwe re dılist, çındık davêt xwe û weha got:
– Nayêm, danakevım !
– Ma êdi tu çı dıxwazi, me waye tu kır qral ji.
Din:
– Naa ! Danakevım, heta hun mın nekın imperator ez nayêm jêrê, an na ezê xwe jı vêderê bavêjım.
Yên lı jêr jı Kalê bı gopal pırsin;
– Ma bı rasti wê xwe bavêje ?
Kal:
– Belê dê xwe bavêje.
Yên lı jêr jı din re gotın:
– Temam e, qebûl e, me tu kır imperator, de heydê were, dakeve, were jêr.
Din:
– Çı karê imperatoreki weki mın dı nava tolaz û pêxwasên wek we de heye ?
– Pır baş, de ka bıbêje bavo ? Ma tu çı dıxwazi ? Em çı bıkın jı bo te ?
Din jı wan pırsi:
– Nıha ez imperator ım ?
Yên lı jêrê;
– Belê ! Tu imperator i !
– Ê, heke imperator ez ım, wê gavê dılê mın bıxwaze ez dê bêm jêr ku nexwaze nayêm. Naxwazım bêm jêr !

Komsêr qeheri û jı xwe re fıkıri û got: "De xwe davêje bıla bavêje lo ! Hema cahnıma wi kıriye, ma dê çı bıbe, pır pır dê dinek jı dınyê kêm bıbe". Lê fıkıri ku dıbe ku tıştek jı ruyê vi dini de bê serê wi.
Komutanê itfaiyê jı Kalê bı gopal pırsi;
– Nıha emê çı bıkın ? Ma bı te ev din dê peyanebe ?
– Dê bê jêr.
– Çawa ?
– Hûn bısekının, ezê wi daxım jêr

Herkes metelmayi mabû, da Kalê bı gopal dê çawa din bıaniya jêrê.
Kal jı din pırsi û got:
– İmperatorê Şehinşah ! Gelo daxwaza we heye ku hun bên derkevın qatê şeşan ?
Din xwe pık kır û bı cıddıyet got:
—Belê !
Dı qulıka ser xêni re ket hundır û dı ser pêlıkan re hat qatê şeşan û dı wır re hat ber pencerê û lı boşahıya dınıhêrt.
Kal disa jê pırsi û got:
– Ya haşmetpenah, gelo daxwaza we heye ku hun derkevın jor qatê pêncan.
Din:
– Belê, ezê derkevım.

Herkes metelmayi mabû. Din ji daketıbû qatê pêncan. Kal disa got.
– Mirê meyi haşmetpenah, gelo nıza daxwaza we yi derketına qatê çaran heye ?
Din qateki dın ji daket. Disa hat ber pencerê û lı yên jêrê dınıhêrt. Kal disa got:
– İmperatorê mıni hêja û paye bılınd, gelo daxwazek we yi jı bo derketına qatê sısêyan heye ?
Din bı bersivdayina;
– Belê ! yê daket qatê sısêyan û disa dı pencerê re dınıhêrt. Êdi weki lı ser xêni nedılist. Cıdiyetek qrali pê gırtıbû. Bı rasti xwe qral dızani.
– İmperatorê meyi berrêz, gelo tu daxwazek we jı bo derketına qatê dudoyan heye ?
– Belê dıxwazım.
Daketıbû qatê dudoyan ji.
– Zati haşmetpenahê me, gelo daxwazek we jı bo derketına qatê yekan heye ?

Din daketıbû qatê yekan ji û dı wê derê re ji derketıbû der hatıbû kuçê, dı nava yên lı jêrê de bû. Dı nav boşahiyê (qerebalıx) re ji rasta rast hat ba kal û destê xwe dani ser mılên wi û got:
– Ero xuya ye ku tu ji din i, lewra din bı dinan dızanın!
Dı pê re jı Komsêr re got:
– De heydê destê mın gırêde û bıbe timarxanê. Lê vê yekê ji hin bıbe da jı dinan re çawa muamele tê kırın.
Din bırın. Hın kes jı nava boşahiyê hatın ba Kal û jê pırsin;
– Apo ma te çawa ev çêkır ?
Kal
– E êê... ev wer hêsan nine, ma ev pênci salın ku em dı nava politikayê de hatıne hıstıran.
Dı pê re bêhnek gırt û got:
– Ax, ax !.. Nıha hema hıneki hêz bıla dı çogên mın de hebûna; ezê ji derketama ser xêni, û hım ji tu keseki ji dê nıkariba mın daxısta jêrê.

— — — — — — — — — — —

Jı pırtûka "Dinek lı ser xêniye", rûpel 7 - 12 hatıye wergerandın jı Tırki bo Kurdi.

Şahînê Soreklî

# CIVATA PÊXEMBERAN

Ti derîyên wek ev derî Ehmedê Oso hîn nedîtibûn. Çelûçar salên jiyana wî li gundê Etmanekê derbas bibûn. Du sê caran di 'omrê xwe de ew çûbû bajêr; carekî bo rihêla zewaca xwe, carekî bo nexweşiya kurê xwe û carekî jî cendirman ew tev nehdeh mirovên din biribûn girtîgeha bajêr pê ku şerek di navbera gundiyan de cîh girtibû. Ti derîyên wisa mezin û bi neqiş û xemlên wilo qeleng li bajêr jî tunebûn. Ehmed nêzikî li derî kir û hîn difikirî gelo ew li kîjan beşê derî xe, dema ku bi nişkekî ve camêrek laşmezin, bejindirêj û bi heybey li pêş çavên wî derket.
– Ehmedê Oso ! Tu çi digerî li va deran ?
Ehmed guhên xwe îna nekirin. Sûfetê wî ji fedîbûna re sor bû û bê ku xwe zep ke, devê wî li hev gerî û got.
– Silabû Elêk.
Mirovê laşmezin li Ehmed nihêrî û keniya.
– Ev bi rastî bibêjin Esselaamû Eleikum We Rehmetullahaahi We Berekatuh. Ehmedê kurê Oso, tu zû bersîva min bide, tu çi digerî li vir ?
– Ehmed xwe da hev, hebkî din bervî mêrik çû û bersîva wî dayê:
– Ez hatim Şêx Gêlanî bibhînim. Bi serê kurê min be, divê ez bi CENABÎ ŞÊX re bê derengî bipeyivim.
Peyayê zeximli Ehmed mêze kir û dîsa keniya:
Kuro bextereşo, ev cîh ne şûna welî û şêxane; ev qonaxa pêxem-

www.arsivakurdi.org

berana.
Ehmed lepê xwe yê rastê hebkî rakir jor, bervî rastê wergerand û bi zimanek xweş qezî kir:
- Rehme li bavê te be. Pêxember hîn ji şêxan çê tirin. Bi kerema xwe rê bide min ez Hezretî Muhemmed bibhînim û yan jî Hezretî Îsa. Ger wexta wan nebe zirar nake, ezê bi Hezretî Mûsa û yan Îbrahîm Îl Xelîl re bipeyivim. Camêr li Ehmed sêr kir, serê xwe leqand û got:
- qedexe ye bo qûl ew, ev derî derbas kin.
Ehmed her du destên xwe vekirin, serê xwe bi hêlekî de xwar kir û ber camêr geriya:
– Ez di bextê bavê teda me, peyayê şîr helal; tu min şûnve venegerînî. Zor pêwîste ez bi pêxemberekî, yan welikî, yan seydakî û yan şêxekî re şorê bikim. Ez di dawa bavê teda me, tu min destvala li riya mal siwar nekî.
Camêr li Ehmed nihêrî û dît çawa kurê Oso serê xwe xwar kirîye. Dilê wî bi Ehmed şewitî, tev ku wî baş dizanibû ku ev serxwar kirina hawak ji fen û fûtên mirovên cotkar bû, yên ku bi sedsalan bêçare û bindest mabûn û ji derdê sultan û beg û axe û şêx û qaçorçî û leşker û cendirman metodek serxwarkirinê peyda kiribûn bo ew bêçarebûna xwe nêşan bidin û dilên yên din bi xwe bişewitînin. Peyayê zexim lê belêm îcar bê ken got.
– Ehmedê kurê Oso ! Îroj civatek pêxemberan heye. Ezê te berdim hindir odeya xwe. Tu dikanî di teqa camîn re ji xwe re li pêxemberan tameşekî.
Çi di salonê de cîh digre, mirov ji odê de dibhîne bê ku bi xwe ji yên di hindir salonê ve were xuya kirin.
– Divê ku tu ji min re sond bixwî ku tu ti teşqelan nekî û dû kutabûna civata pêxemberan bê deng di ev derî re werî der.
Tew bê ku bi aqilê xwe bişêwire, Ehmed şertên mêrik qebûl kir û sond xwar. "Mal ava" di dilê xwe de got Ehmed, "mirov her roj li pêxemberan rast nayê. Ezê ev fersenda zêrîn çawa ji dest xwe berdim ! Wey xweê ji ev peya yê bi dîn û îman razî be".

Salon bi carekî de tiji ronahî bû. Ti çirayên wisa bi şewq Ehmed di omrê xwe de hîn nedîtibûn. Hejmara dilê wî bi carekî de rabû jor dema derîyek biçûk di quncikekî salonê de vebû û hin mirovên bi kincên gewr, yek dû yekî, ketin hindir. Her pêxemberekî şûna xwe li paş mase kî girt. Rûyên pêxemberan ji Ehmed ve xuya nedikirin. Ji sûfetê Ehmed ve dihat zanîn ku ew hebkî silsar bibû, wek mirovek yê ku cizdanekî bi rêve dibhîne û hêvî dike cizdan tiji pere be lê belêm ji 2 -3 panxirotan bêtır di cizdên de nabhîne. Dû demek kin çiran dest pêkirin melûl bibin. Li pêş pêxemberan du perdeyên mezin ronnahî bûn. Ev perdan sînema bajêr ya servekirî anîn bîra Ahmed. Dema ew bo rihela xwe çûbû bajêr, pismamê wî ew biribû sînemê bo ew tev li keçikên çaqrût û lêvsor sêr kin. Li ser perdeya yekemîn dukanek nayê hesaban xuya kir. Mezinbûn û firehbûna dukanê nediket aqilan. Jin û peyan erebeyên hesinî li pêş xwe dajotin û tiji hûr mûr dikirin. Her erebekî ji barê 'etarekî bêtir tişt têde hebû. Dukan wek mezatek sergirtî bû û ji derzî û dezî de bigir heta sêv û pûrteqalan têde hebûn. Carekî beşek dukanê zor baş hat xuya kirin. Ehmed ecêb mayî ma, ji ber ku di ev beşê dukanê de hûr mûr tenê bo pisîk û segan dihat firotin. Xwarina qutiyan, ya tûrikan, xwarina nerm, ya'işk, goştê gan, miyan, kêrguyan, masiyan ûhd. hevsar, dermanê sipî û kêçan, sabûnên reng rengî, şe û firçe û pir tiştên din. "Xweziya min bi dilên kûçik û pisîkên vî welatî be" got Ehmed di dilê xwe de, "ev sedî sed cinnete". Di vê deqê de perdeya din jî dest pêkir weneyan bide nêşan. Zarokên reşik, zarokên esmer, bi hezaran zarokên birçî û tazî. Zikên wan repitî, çaqên wan wek qîtikan, çavên wan di kortê de, porê wan weşiyayî, sûfetên wan çerm û hestî, û dengek zirav ji wan dihat der. "Birçî me, birçî me, birçî me anê, birçî me"

Li ser perdeya yekemîn wêne hat guhertin. Li welatek cîhanê hin mirovan berê lûleyên tifingên xwe didan serên gayên xwe, ew dikujtin û laşên wan davêtin kortek meizn. Ev mirovan ji rojnamevankî re digotin: "Ger hukmat destûr nede me bo em goştê gayên xwe bihatir bifroşin, emê roj bi roj hin gayên xwe bikujin" Dûre gemîyek li ser perdê derket ya ku bi mencenîqan pûrteqal davêtin hindir behrê, ji ber ku tucarên pûrteqalan nedixwastin pûrteqal li li bajêr pir bibin çimkî piraniya pûrteqalan heqê wan erzan dike. Carekî dengê zengilekî hat û wene hatin guhertin. Li ser perdakî hakimekî şeş meh ceza dida xortek gundî, ji ber ku wî bizinek ji şivanê gundek din dizî bû. Di perda din de cendirman bi hukmê zorê alîkarî bo hukmatê ji gundiyan distandin. Zengil dîsa lêket. Wêne niha êdî zûtir dilivivan. Li ser perdakî dadegehek hukmatekî cezê mirinê dida du xortan, ji ber ku wan qurşîn avêtibûn tombîlek leşkerên hukmatê. Li ser perda din leşkerên ew hukmat bi sedan mirov dikujtin. Zengil dîsa lêket. Li ser perdakî dadegehek welatek mezin 30 sal ceza didan xortek reş, ji ber ku wî pere ji bankekî dizîbûn. Di perda din de şirketên ew welat bi milyonan pere ji welatên paşve - mayî û belengaz derdixistin. Li ser perdakî serokên hin welatan gotina azadî û serbestî û biratiya mirovan dikirin û li ser perda din jî balefir û zirxlîyên wan agir berdidan ser azadîxwazên welatên wan û yên din.

Bo hukmat û leşkerên wan kujtin û talan kirin qanûn û edalet bû; ruxseta wan hebû ew bi hezaran mirov bikujin, di girtıgehan kin û xelkê welatên xwe talan kin lê belêm bo ewên ne bi ruxset kujtina mişkekî jî cerîmet û

"terorîzm" dihat hesbandin. Carekî li ser perdakî weneyek xuya kir. Ehmed dît çawa çar pênc pêxember bi hevre rabûn û destek xwe ber perdê dirêj kirin. Di weneyê de pirtûk dihatin şewtandin, ji ber ku ew bi zimanek qedexebûyi hatibûn çap kirin. Hin pêxemberan serên xwe ji qehran dihezandin. Dû re zengil bi dirêjî lêket. Hejmara perdan gihişt heftan û li ser wan wene hatin pêşkêş kirin. Ji ber çar hêlên salonê deng ji sandiqên reş dihatin der. Çavên Ehmed bûn wek tasan; projektora Tirkî ya li ser sînor hat bîra wî, stûyê wî bû wek yê dîk, guhên wî bûn wek antêla radyo ya muxtarê gund; ango Ehmedê Oso nedizanibû li ku sêr ke û li ku sêr neke, guhên xwe bide ser dengê ev sandiqa li hêla çepê lê ya li hêla rastê, ya li pêşı lê ya li paşî. Ji beşekî ev deng dihat. "Ey xudayê li jor, pêxember ! Bavê min kujtin, birayê min kujtin û şeva bihurî jî kurê min tev heft xortên din kujtin, lepên wan ji wan qutkirin, serên wan dûr xistin û laşên wan avêtin çem. Bese êdî, werin alîkariya me !" Ji beşek din ev deng dihat: "Jina min nexweşe, pere tune ez bibin tixtor, zarokên min tazî, birçî Ey xudayê delal, ey xudayê cîhanê, bo çi te baran li ser me birî, zad û genimên me işk kirin, de ezê berê xwe bidim kîjan derî ? " Ji hin hêlan dengê girî û nalîna nesaxan dihat, ji hin beşan dengê kenê mirovan dihat... Çavên Ehmed jî heyiribûn berê xwe bidin kîjan perdê û weneyê; muftî û melan, serok û wezîran, qehpe û qûndan, yên rapaşî keran dikin, cendirme û mamûran, qumendar û xwînrêjan, derwçîn û bêbextan, bindest û belengazan? Kurê Oso nedizanibû guhên xwe bide ser dengê qulpikên ziktêran, nalîn û qîrîna yên şewitî, yên xanî li ser hilweşiyayî, yan ser girî û gazincên sêwîyan ? Ji hemû quncik û beşên dunê wene dihatin ber çavên pêxemberan; kujtin, serjêkirin, talankirin, agir, bombe, gule, mirina zarokan, jinan, pîr û kalan, bindestbûna gelan, rindî û pîsî, ken û girî; nexweşxanên pak û fireh hember nivîştên şêx û melan, cîhên bi ronahî û gundên tarî û şevreş, tombîlên reng rengî û kerên bi çerm û hestî, balefirên ji deng beza tir û zarokên bê xwendin, qonaxên 40 qatî û qubên kelpîçîn...

Di hindir salonê de dîsa çira vêketin. Perde neman wêneyan raber dikin û dengê sandiqan jî hat seknandin. Pêxemberan bi destên xwe li pêsîrên xwe dixistin. Tev ku dengên wan nedihat Ehmed, ji wîve baş xuya dikir ku ew digrîne.

Ehmedê Oso ji xwe re bala xwe da pêxemberan û bi rastî dilê wî bi wan şewitî, lêbelêm ji hêlekî de jî bêçarebûna wan û pasîv- mayîna wan li hember ev tiştên li cîhanê cîh digrin Ehmed xulemîş kirin. Bê ku niyeta xwe dartmîş ke rabû ser xwe û qîrî:
– Girî ti faydê li kesî nake. Belengaz û perîşan bi şev û roj berê xwe didin we û ji we alîkarî hêvî dikin. Hûn bi hêstirên xwe dixwazin agirê di hindir dilên wan de vemrînin ? Ma bi girî çi di be ? Ger hêstiran fayde bikirana kesek li ser erdê birçî û tî nedima. Wax, wax ! Xwelî li serê me fiqaran be..." Aşkere xuya bû ku pêxemberan dengê Ehmed nedibîstin û haya wan ji wî tune bû. Ehmed dest pêkir bi her du destên xwe li camê xe:


- Ez dixwazim xwedê bi xwe bibhînim û bi wı re şorê bikim. Ez dixwazim...
Bi carekî ve peyayê zexim ket hindir, destek xwe da ser devê Ehmed û bi destê din ew şûnve kişand.
- Ma tu dixwazî,ez te rakim jor û bavêjim erdê ? Ma te sondê xwe ji xwe bîra kir ? Ma min ji te re negot ev şûn ne bo yên wek te ye ?
Bi rastî Ehmed ji tirsa re bizdoyî bû. Mirovê laşmezin bi çepelên wî girt, bir jêr û di deriyê mezin re avêt der.

Di hindir xanîkî kelpîçîn de peyak ramediya bû. Deng û his jê nedihat. Jinek li hevhatî ber serê wî rûniştîbû û cixare dikişand. Mêrê wê şeva bihurî, dû yasiyan ji gundê şêx hatibû û ber têkeve şeltê li ser merîd û êldefiyan û şişan peyivî bû. Dû rohilat mêrik ji xew ranebibû. Nazê, jina wî, deng lê kiri bû, ew hizandibû, leqandibû, çi kir çi nekiribû mêrê wê ji xew ranebibû, tew deng jî ji wî derneketibû. Lawê wan yê mezin çûbû pê şêx lê belêm şêx çûbû gundek din. Li gund ti tixtor tunebûn, nejî tombîl hebûn bo wî rakin bajêr. Pîrek gund pîvaz şikandinbû û dabû ber pozê wî, peyan ava sar li wî kiribûn, zanayê gund "Sûret Yasîn" li ser xwendibû, jina wî karek serjê kiribû û goştê karê li gund belav kiribû lê belêm bê fayde.

Nazê serê xwe li ser her du milên xwe leqand û hın dest pêkir bibêje:
- Ax li min rebenê, de rabe êdî Ehmedê min, ronediyê min...
Dema mêrê wê veciniqî, çongên wî heziyan, qîrî û xwe ji nîşkava ji şeltê çekir, rabû ser lingan. Bi qîrîna wî re kurê wî jî ket hindir û bi alîkariya dayka xwe bavê xwe rûnişkandin da. Nazê zû ta sek av hanî û berve devê Ehmed bir:
- Vexwe, vexwe, xêre, îşella xêre. Malava te em gihbizdoyî kirin. Gelo ev çi bêtar bû hat serê te ? Ehmedê Oso xwe da hev û bersîva Nazê da:
Ber ez razêm, min 'Ayetul Kurdî' xwend û ji xwedê rica kir ew Şêx Gêlanî di xewnê de bişîne cem min bo ez ji wî çend tiştan daxwaz bikim, lê belêm ez bi xeletî çûm li civata pêxemberan rast hatim. Neûzû billah, neûzû billah ! Nale li çavên şeytan yê kullî kor were...
Nazê serê xwe dîsa leqand û bi dilek tiji kul û keser:
Aax, ax ! Ehmedê Oso, tu çi digerî li kaş ta bibhînî xewnên şaş !..

www.arsivakurdi.org

# XAÇERÊZ



## BERSIVA HEJMARA 15'AN

| | 1 | 2 | 3 | 4 | 5 | 6 | 7 | 8 | 9 | 10 | 11 | 12 |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| 1 | D | E | Ş | T | ■ | N | E | W | A | L | ■ | O |
| 2 | O | L | ■ | İ | S | O | T | ■ | Y | Ê | ■ | L |
| 3 | L | A | N | ■ | ■ | ■ | İ | P | İ | R | N | İ |
| 4 | ■ | M | ■ | L | İ | Q | ■ | ■ | Q | E | M | ■ |
| 5 | M | A | Q | A | M | ■ | N | ■ | ■ | ■ | ■ | İ |
| 6 | İ | T | U | T | ■ | B | O | T | İ | Y | A | N |
| 7 | T | ■ | N | ■ | B | İ | R | A | N | İ | N | ■ |
| 8 | ■ | A | T | E | İ | S | T | ■ | ■ | Ş | A | N |
| 9 | A | L | A | N | ■ | T | A | R | İ | ■ | Z | O |
| 10 | V | Ê | R | A | N | ■ | P | A | R | İ | ■ | L |

### ÇEPERAST

1- Dı serihıldana Dêrsımê de serektiya serihıldanê dıkır. - Bênder lı babû bışûn de genım dımine, ew dıçe.
2- Karê kon vegırtın û pez xwedikırınê (berepaş) - Kesê dindar.
3 Hejmarek. Dı alfabeya Kurdi de herfa yekem. Xwendına her feki bêdeng
4 Bûyerek xuzayê (tabiat) ê (berepaş). - Dı maneya heta, heya, yê hetani, de tê bıkaranin (berepaş). Qısım, par.
5- Dı maneya Konsolosxane de tê bıkaranin.
6 Cephe. - Paş, (berepaş)
7- Şairek jı Kurdıstana Iraqê, dı sedsala 18 û 19 yan de ji ye. Bes tek wi wehaye:

*Nemırdım eger em care bê to*
*Neçım şert be heta em xware bê to.*
*Derûnım xali ye, wek ney denale*
*Hewareki çı pır haware bê to.*

Serbıxwe, şad. Dı Kurdi de pronavê işaretê.
8- Nidayek. - Bı Dımıli lêv.
9- Xani, mal. - İlac, derman.
9- Heyat, herweha navê kovareke Kurdi bû ji ku dı 1918 an de lı İstenbolê çap dıbû. Bı Sorani k gır, mezın. - Kesê bê av mayi (berepaş).

### SEREJÊR

1 Dı çirokeke Kurdi de navê qehremani wi ku bûyer lı ali çıyayê Sipanê pêk hatiye.
2- Dewrêş lê dıxın. - Kesê bê mêr an bê jın mayi
3- Hejmarek. - Bı Dımıli neynık, ayine, mırık. - Gotına neyiniyê (berepaş).
4- Bı Sorani dı maneya "çı" de tê gotın (berepaş). Nidayek.
5- Bijişk hekim.
6- Kurtenıvisa Kron'ê (berepaş). - Nidayek her weha dı maneya heri, turab de ye ji.
7 Lı hın deran dı maneya qum, remıl de tê bıkaranin.
8- Cot, ne fer. - Dı maneya gazi û imdat de tê bıkaranin her weha navê kovareke Kurdi ye ku gelek bı nav û deng bû.
9 Axaftına telefonê. Zad, xurd (berepaş). - Dı alfabeya Kurdi de xwendına herfeki bêdeng
10 Pis, zışt, lewıti, ne baş, bê yom. Dı zaravayê Sorani de dı maneya lı ' de tê bıkaranin.
11 Negıhiştiye, xave.– Enstituya Kurd lı Paris kovareke nu derxıst, navê wê.
12- Lı Kurdistana Tırkiyê lı heremê Sêweregê Eşirek.-Bı Sorani dı maneya hêvi de tê gotın.

DERDİ DÛRİ, DERDİ DÛRİ KUŞTIMİ
DERDİ WUŞYARİ -SEBÛRİ KUŞTIMİ
YADİ YARAN Û WILATIM ROJ Û ŞEW
LÊ HERAM KIRDIM QERAR Û XURDÛXEW

HÊMIN

www.arsivakurd.org




www.arsivakurd.org

*BERBANG*
*TUNNELGATAN. 14, 3 tr.*
*111 37 STOCKHOLM*

MASSKORSBAND

# B3 Kurder i Sverige

En fördjupningskurs om den kurdiska folkgruppen och dess situation i Sverige. Kursen anordnas i samråd med Kurdiska Riksförbundet.

| | |
|---|---|
| Tid | 3 dagar, 4 - 6 april 1984 |
| Plats | Kyrkans kursgård, Sigtuna |
| Deltagare | Journalister, tjänstemän och invandrarbyråpersonal som kommer i kontakt med kurder, förtroendevalda i stat och kommun samt representanter för den kurdiska folkgruppen och dess organisationer |
| Kursavgift | Ingen (Deltagarna betalar liksom vid övriga SIV-kurser sina egna resor) |
| Information | Ytterligare upplysningar om kursen kan sökas hos SIVs kontaktpersoner Orvar Hjelm (011/10 88 00/1072) eller hos Lars-Gunnar Eriksson (011/10 88 00/1105) |
| Anmälan | Deltagaranmälan skall senast måndagen den 27 februari vara invandrarverket tillhanda under adress<br><br>SIVs informationsbyrå<br>Att: Lars-Gunnar Eriksson<br>Box 6113<br>600 06 NORRKÖPING |

**Jı ali İnvandrarverket û Federasyona Komelên Kurdistan ve sê rojan seminerek lı ser Kurdan dê bête dayin. Dı vê seminerê de axaftın û raberızin dê lı ser tarix, edebiyat, zıman, kultur, rêxıstın û problemên Kurdên ku lı Swêd dıjin û jı bo van probleman pêşneyar û ditınên xwe dê pêşkêş bıkın. Dı vê seminerê de jı bo van gelşan jı ali 7 kesan ve, komiteyek pêkaninê hatiye damezrandın, jı wan sê kes Kurd (Jı Federasyonê), çar kes ji jı İnvandrarverket ın.**

**Derheqê vê seminerê de hûn dıkarın jı Federasyon û İnvandrarverketê agahdari bıgrın.**

www.arsivakurdi.org